

## '150 hezar kurd ji mafên hemwelatîyê bêpar in'

Sekreterê PYDK-Sûrî Îsmail Emo li ser rewşa kurdên Başûrê Biçûk wiha dibêje: "Îro, hejmarê kurdên bênifûs bêhtirî 150 hezar mirovî heye, ew ji mafên karkirina li ba dewletê, xwendina fêrgehên bilind, derketina derve û razana hotêlan bêpar in. Her diçe, hejmarê van belengazan pir dibe."

Rûpel 8-9

## DIPLOMASÎ

### Amerîka dixwaze Başûr bike warê kontrayan

Yek ji faktorên pêwist li Iraq û Rojhilata Navîn jî gelşa kurdan e. Planekî dewleta Amerîka û dewleta Tirkiyeyê jî ew e ku hezên YNK'ê kêm bikin, PDK bi hêztir bikin da ku yek hêz li Başûr bimîne û di dawiyê de otonomiyekê sexte ji kurdan re li Iraqê pêk bînin.

Rûpel 5

## DINYA

### Berdêla rojnamegeriya durist li Cezaîrê mirin e

Salîma Xezalî li ser rewşa rojnamevaniya li Cezaîrê wiha dibêje: "Ji roja ku şerê hundirîn li Cezaîrê dest pê kiriye he ta îro, nêzîkî 40 rojnamevan hatine kuştin. Dema li cihekî bûyereke biqewime, an jî yek bê kuştin, em bi xwe nikarin pirsyarî an jî lêgerînê bikin; em nikarin nûçevanan bişînin cihê bûyerê."

Rûpel 16

## DÎROK

### Dizên dîroka kurdan

Nebêjin me her tişt bihistibû, lê dizîna dîrokê ne bihistibû. Tê zanîn ku dîroka beriya nivîsê bi bermahiyan hatiye tesbîtkirin. Çiqas bermahiyan Mezopotamyayê yên Kurdistanê hene, an hatine dizîn an jî hatine talankirin.

Rûpel 7



Lê daykê  
Her ho nabît  
Zîndan, her mala min  
nabît  
Şînî, her karê te nabît  
Bihara me, her di zikê  
hûtî da nabît  
Sibe dîwarê xilole dê  
herifin  
Qeyd û zincîr, dê  
herrişin  
Qamçiyê reş, dê  
bin bizot.  
Leşê xudanê xo sojin  
Dê hême ve û dê  
rezgar bîn  
Ez ji dîwara û  
Tu ji xerîbiyê...

Mueyid Teyib

Rêxistinên sivîl li ser şerê di navbera PKK'ê û dewletê de wiha dibêjin:

# ÎNSANÎKIRINA ŞER PÊWIST E'

● Rêxistinên demokratîk ên sivîl wekî ÎHD, KHRP, TO-HAV'ê li ser mafdarbûna daxwaza dîlên şer a ji bo pêkhatina Peymana Cenevreyê ya Şer gihîştin hev. Ev saziyên însanî didin zanîn ku ji bo mirovîkirina mercên şer divê her du alî jî peymanê qebûl bikin û li gorî wê hereket bikin. Tê gotin ku bi vê yekê qet nebe wê êş û janên ku di şer de tînin kişandin hindik bibin. Ji aliyê din ve qebûlkirina hiqûqa şer, ji bo pêkhatina aştîyê jî pêwist tê dîtin.

● Rêveberê KHRP'ê Kerim Yıldız wiha dibêje: "Hiqûqa navneteweyî, prensîbên Peymana Cenevreyê bi taybetî jî protokola 1977'an, aliyên şer û mafên dîlan tesbît û garanî dikin. Her wiha Peymana Ewropa û REHE'yê jî heman norman dipejirîne. Her çiqas KT'ê protokola 1977'an îmze nekiribe jî, li gorî hiqûqa navneteweyî peyman wê girê dide." Yıldız dide zanîn ku PKK'ê di sala 1995'an de ev peyman û protokolên pêvedanî, îmze kirine.

Rûpel 2

Însanîkirina şer  
pêwist e

**B**i greva birçûbûnê tevî daxwaza aştiyê hiqûqa şer û Peymana Cenevreyê ya Şer jî kete rojevê. Me jî xwest li ser vê mijarê ramanên komeleyên Însanî hîn bibin. Lewre jî me pirsên xwe gihandin hinek rêxistinên wekî Mazlûm Der, TOHAV, KHRP, Rêxistina Efûyê, Heyva Sor a Kurdistanê û çend kesên din. Ji ber ku ÎHD'yê li ser vê mijarê dîtinên xwe bi daxuyaniyekê diyar kiribû, me hewce nedît em careke din jê bipirsin. Ji wan kes û saziyan bi tenê Serokê TOHAV'ê Talat Tepe û Rêveberê Projeya Mafên Mirovan yê Kurdistanê (KHRP) Kerim Yıldız bersivên xwe gihandin me. Hemû daxuyaniyên ku gihîştin destê me mafdariya dîlên şer destnîşanî dikin û didin zanîn ku daxwaza dîlan a li ser Peymana Cenevreyê li cih e.

Rêveberê KHRP'ê Kerim Yıldız wiha dibêje: "Hiqûqa navneteweyî, prensîbên Peymana Cenevreyê bi taybetî jî protokola 1977'an aliyên şer û mafên dîlan garantî dikin. Her wiha Peymana Ewropayê û REHE'yê jî heman norman dipejirîne. Her çiqas KT'ê protokola 1977'an îmze nekiribe jî, li gorî hiqûqa navneteweyî peyman wê girê dide." Yıldız dide zanîn ku PKK'ê di sala 1995'an de ev peyman û protokolên pêvedanî, îmze kirine. Komela Mafên Mirovan (ÎHD) jî di daxuyaniya xwe de tevî banga aştiyê, banga insanîkirina şer dike. Ji bo vê yekê jî tê xwestin ku her du alî jî li gorî Peymana Cenevreyê hereket bikin. Daxuyanî bi bîr dixwe ku ÎHD'ê di 24'ê kewçêra 1994'an de li ser vê mijarê biryar girtiye. Her wiha ÎHD balê dikişîne ser biryarên MGK'ê yê şer û pêkutiyê.

Li mijarê Serokê Waqfa Lêkolînên Hiqûqa Civakî (TOHAV) Ebûqat Talat Tepe, jî pêkanîna şertên Peymana Cenevreyê ku di sala 1949'an hate perijandin wekî, insanîkirina qeydeyên şer dibîne, lewre jî daxwaza dîlan wekî daxwazeke herî insanî dibîne. Li gorî Tepe jixwe her du alî jî (çi eşkere, çi veşarî) hebûna şer dipejirînin, lewre jî şer bi du aliyên tê meşandin, nexwe qebûlkirina hiqûqa şer ji bo kêmkirina êş û janên şer tiştêkî pêwist e.

SAMÎ BERBANG

Dêrsim ji kirinên dewletê bêzar bûye

**H**eyeta Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a ku di navbera 13-15'yê gelawêjê de çûbû Dêrsimê, di 16'ê mehê de bi daxuyaniyekê çavderiyên xwe pêşkêşî raya giştî kirin. Heyetê tevî rayedarên saziyên dewletê, bi nûnerên saziyên sivil û gel re jî hevdîtin çêkirine.

Serokê Belediyeya Dêrsimê Mazlum Arslan, daye zanîn ku arîşe û problemên gel zehf in, piştî koçkirinên nifûsa bajêr ji 25 hezaran gihîştîye 40 hezarî, lewre xanî bi dest gelek mirovan nakevin, di konan de dimînin. Li gundan jî ber ambargoyê rewşa mirovan gelek xerab e. Li ser vê yekê Waliyê Dêrsimê jî wiha dibêje: "Me bi vê ambargoyê derbeyeke mezin li PKK'ê xist." Wali hejmara gundên ku hatine valakirin jî wekî 123 diyar dike. Têkiliyên hinek navçeyên wekî Pûlûrê bi Dêrsimê re qut bûne.

Li gorî çavderiyên heyetê rewşa gel pir xerab e. Li gorî agahiyan ku gel dane ev sal û nîvek e ku am-



Piştî êrişa gerîla, tîmên taybet li ser gel teroreke mezin pîk anîne.

bargoya qût didome. Piştî saet 17'yan kamyonên fêkî û sewziyan heta serê sibê li ber deriyê qereqolan tîn girêdan û piraniya aşan jî hatine xerakirin. Her wiha hêzên dewletê pirên Dinar û Anafatmayê jî holê rakirine, lewre jî rewşa gundiyan li aliyê din pir xerab e. Li gorî gotina gel, di 3'yê tîrmehê de jinek bi navê Beşer Mengeç winda bûye, roja 16'yê mehê cendekê wê yê gulebarankirî hatiye dîtin.

Bi taybetî kirinên

tîmên taybet ên piştî êrişa gerîla ya 18'yê gelawêjê, gel bêzar kiriyê. Piştî ku sê endamên tîmên taybet jî aliyê gerîla ve tîn kuştin, tîm li ber Nexwşxaneya Dewletê berikan direşînin ser gel, şofêrê ambûlansê Zeynel Göyıldar jî tîman lêdaneke xedar dixwe. Tîm bi vê jî namînin, li ser Pira Munzûrê camên erebeyan dişikînin, mirovan jî erebeyan dadixînin, li wan didin. Ew li sûka bajêr bi tiliyên xwe nişana

gundê boz dikin û tevî dînanînan gefan li gel dixwin. Li taxa Alganli qehwexaneyek tê texprîbkirin, tîm bi qûndaxên çekên xwe li xwediyê qehwexaneyê Hayati Söylemez dixin. Li Taxa Yenimahalleyê di sehkirina malan de kal û ciwanan di erdê re kaş dikin, haqaretê li jinan dikin. Niha her çiqas tîm jî bajêr vekişîbin jî, gel bawer dike ku ev tiştêkî demdemî ye. Tevî ew qas zerar û ziyar walî bi tenê 250 milyon li

maxdûran belav kiriyê.

Hin gund hene, hêzên dewletê cara duyemîn şewitandin. Wekî minak gundê Pilvengê (De-deağaç) di 5'ê gelawêjê cara duyemîn hatiye şewitandin."

Gel hêviya xwe ji dewletê biriyê, li hêzên teqînê ye. Dibejin: "Heke heye, bila dewlet destê xwe yê alikariyê dirêjî me bike. Lê em destê wê yê zilm û şidetê naxwazin."

Welatê Me/ Stenbol

Tirkiye bi jiyana penaberan dilîze

**N**êzî mehekê ye ku 155 mirovên îranî xwe raptirine navenda BSP'ê û avahiya Marmakê ya vî partiye. Ji ber ku Tirkiyeyê dix-

west van mirovan radestî Îranê bike, wan jî serî li vî çarayê daye. Li ser rewşa van însanan roja 23'yê gelawêjê rayedarê BSP'ê Oğuz Ender ev agahî

dan rojnameya me: "Berî 20 rojan van mirovên îranî xwe raptirine partiya me. 65 jê zarok, niha hejmara wan gihîştîye 155 kesî. Ê herî nûhatî, salû-

nîvekê berî niha hatiye kesî qala îfadeyê nekiriye, lê bi hatine wezîrê karê derve yê Îranê, dewleta tirk biryara li Îranê vegeandina van mirovan aniye rojevê. Li gorî Peymana Cenevreyê îfadekirina mirovan bi darê zorê qedexe ye, lê Tirkiyeyê di 30'yê sermaweza 1994'an de biryarnameyek derxistiye û daye zanîn ku li ser penaberên ku ji Asya û Rojhilata Navîn tîn ew xwedî raye ye." Rayedarê Partiya Sosyalîstên Yekbûyî di vî biryarê de cotpîvanî û biçûkdîtina mirovên rojhilatî destnîşan dike.

Niha ev mirovên ku ji netewe û bîr û baweriyên cur bi cur ên muxalîf in, dixwa-

zin Neteweyên Yekbûyî (NY) mafê penaberiyê bide wan û rîya welatekî sêyemîn li ber wan vebe.

Li ser daxwaza me jineke ji Mehabada Kurdistanê ji me re rewşa xwe wiha diyar kir: "Em ji NY'ê dixwazin ku mafê penaberiyê bide me, em giş mirovên siyasî ne, jixwe rewşa Îranê herkes dizane, heke em bikevin destê vê rejîmê wê me bikuje. Ev rejîma dîktatorî mirovan dikuje, îdam dike, bi salan zîndan dike." Li gorî agahiyan Tirkiye û NY berpirsiyê diavêje ser yê din, lê penaberan jî biryara xwe dane, heta çareyek neyê dîtin ewê li ber xwe bidin.

Welatê Me  
Stenbol

Di tîrmehê de binpêkirina mafên mirovan

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) bilançoya binpêkirina mafên mirovan ya meha tîrmehê diyar kir. Tê de ev agahiyan jêrin dide:

- Binçavkirin: 1572
- Kedkarên çapemeniyê ku hatine binçavkirin: 62
- Girtin: 117
- Livbaziyan li dijî sivilan: 16 kuştin, 18 birîndarî
- Êrişên kiryar nediyar: 13 kuştin, 19 birîndarî
- Di binçav de windakirin: 19
- Înfazkirin, îşkence û di binçav de kuştin: 14
- Îdiyan îşkenceyê: 23
- Gund û mezrayên ku hatine valakirin: 9
- Kesên ku ji kar hatine derxistin: 354
- Kesên di şer de mirine: 392
- Cezayên heps û pereyan: 2 milyar 221 milyon 9 sal cezayê hepsê.
- Cezayê ku tê xwestin: 134 sal 5 meh
- Weşanên hatine berhev kirin: 30
- Cihên ku hatine bombakirin: 9
- Komele, sendîka û weşanên ku hatine girtin: 7
- Cihên ku polîsan avêtine ser: 23
- Girtiyên ji ber bîr û baweriyên: 171

LI BAŞŪR ASİTİ!...



## Greva birçîbûnê qediya

Greva birçîbûnê ku di 14'ê tîrmehê de bi beşdariya zêdetirî 10 hezar dilên PKK'yî û malîyên wan dest pê kiribû, bi xwepêşdana zarokên kurd û daxuyanîyekê qediya. Zarokên Agir roja 19'ê gelawêjê li Altunizade û li ser Pira Galatayê (Stenbol) rê birîn, daxwaza xwe ya aştiyê anîn ziman. Nêzî 500

zarok û malbatên wan beşdarî her du çalakîyan bûn. Polîsan êriş birin ser zarokan, gelek ji wan girtin bin çav, lê piştê ew hatin berdan. Li ser Pira Galatayê e-bûqatên IHD'ê Mercan Güçlü, Mustafa Ayzit, Müjgan Aslan, Altun Zeng û Müslüm Erçetin hatibûn çavdêriya 200 zarokî, lê polîsan ew girtin binçav.

Li vê derê daxuyanîyêke nûnerên dilan hate belavkirin ku tê de qala qedînadina birçîbûnê dibû. Tê gotin ku çalakîyê bandoreke mezin li ser raya giştî hiştiye û li seranserê dinyayê deng vedaye. Nûnerên dilan spasiyên xwe pêşkêşî hemû mirovên ku piştewaniya wan kiriye, dikin û dibêjin: "Em bi taybetî spasiyên

xwe pêşkêşî berxwedêrên Zapata, welatparêzên İrlandî, Pilingên Tamîl Elamê dikin." Dîsa ew didin zanîn ku gelek kesên rewşenbîr, pêşverû yên ji gelên Anadolu jî ew bi tenê nehiştine û spasiyên xwe pêşkêşî wan jî dikin.

Tê gotin ev livbazî bûye tovê serhildanan.

Welatê Me/ Stenbol

## Zarokên Agir û Rojê bi ser ketin

Roja 19 gelawêjê li bin Pira Galatayê (Stenbol) ji bo bazirganîyê dimeneke xerîb hebû. Qareqara zarokan bû, ji ber dezgehê dibezîn ber dezgehê din. Çavên wan mabû li ser erebe û pêlîskan, lewre hinekên wan livbazî ji bir kiribûn. Bi vî awayî xwe gihandin ser pirê.

Dema wan rê birî

bû tûretûra erebeyan, bi taybetî ji otobûsên belediyeyê. Hinek mirov ji otobûsan peyabûn û bi çepikan piştgiriya xwe nîşan dan. Pir neçû, dengê sîrena erebeyên polîsan hate bihîstin. Zarok hinekî bi vî dengî ne xweş bûn, lê bi hatina polîsan dengê sloganên bilintir bû: "Barîş İsteriz" ango em aştiyê dixwazin. Piştî hinek

xireciran, polîsan êriş bir ser zarokan, dîreksiyona erebeya xwe badan ser zarokan. Polîs bi pêhûn û şimaqan bi nav zarokan ketin û ew belav kirin. Zarokeke ku ji ber lêdana polîsan jan dişand, ji çavên wê rondik dibariyan, digot: "Ji dayika min re bibêjin, me qezenc kir, we gişkan dît me qezenc kir."

CEWDET QŪŞMAN



## Dewlet dikuje, nahêle rastî derkeve hole



Sinan Demirbaş xwendevanekî kurd û şoreşger e. Sinan di sala 1971'î de li Elezîzê tê dinyayê. Berî ku bê kuştin li Zanistgeha Uludaxê ya Bursayê di beşa fizîkê pola 3'yan de dixwîne, wî dil heye derbasî beşa hiqûqê bibe. Ji ber ku leşkeriya wî ji bo du salan hatiye tecflîkirin, tu metirsî û endîşeya wî nîn e di vî warî de, lê rojekê ji qereqolê bangî wî

dikin, bi îdiaya ku ew qaçaxê leşkeriyê ye. 8 polîsên terore wî dibin û piştî demekê jî xebera kuştina wî tînin.

Li gorî dozger û Midurê Emniyetê yê Elezîzê Sinan bi rê ve serê xwe li pêpelûkê daye miriye. Wan ew biriye nexweşxaneyê, lê bi ameliyatê jî xelas nebû. Dr. Ömer Aydın li ser bûyerê tişteki din dibêje: "Dema Sinan anîn

vir jixwe miribû, polîsan bi darê zorê serê Sinan bi min dan qelaştin û pişt re jî dan dirûtin. Ez hîn jî ji bin bandora vê bûyerê nefilitîme. Dema ew anîn laşê wî reş bûbû, pir derb lê xistibûn."

Malbata Sinan hê jî ji bo otopsiyêkê têkûz têdikoşin, lê dewlet jî ji bo ku rastiyê veşêre, çî ji destê wê tê, dike.

Welatê Me  
Stenbol

## ...KURTENŪÇE...

### Şemzînan tê şewitandin

Heftiya çûyî li Şemzînana Culemergê, dewletê dest bi operasyonê kiribû. Di vê operasyonê de nêzîkî 500 dekar daristan ji aliyê dewletê ve hate şewitandin û şewitîna daristanan bi rojan li qûntara çiya û girên mintiqê dewam kir. Kesên ji Şemzînanê dibêjin ku: "İtfaiye ji bo tefandina daristanan tişteki nekir."

### MGK dixwaze dengên alternatîf bibire

Piştî biryara sansûrîkirin û girtina weşanên nivîskî, vêga jî MGK li hemberî weşana radyoyan civînan çêdikin. Dixwazin, li hemberî radyoyên dijber, ên bi taybetî li Kurdistanê weşanên xwe dikin, dest biavêjin hin tedbiran. Ji ber ku hin ji wan seyar dixebitin, nikarin cihê wan tesbît bikin. Her wiha MGK ji bo ku rê li ber hinek radyoyên li derve bigire jî wê xebatê bike.

### Li Çelê 6 hezar cerdevan çekê xwe datînin

Piştî ku leşker bi 45 km'yî ji Çelê (Çukurca) dûr ketin, nêzîkî 6 hezar cerdevanên ertuşî dixwazin çekên xwe deynin. Ew dibêjin: "Li vir hem ambargoya qût heye, hem jî dewletê em tenê hiştine." Li gorî agahiyan, navbera cerdevan û hêzên dewletê ne baş e. Piştî vê bûyerê, Serokê YDH'ê Cem Boyner, daxuyand ku ji bo ku bala dewletê bikişîne ser vê herêmê wê here herêmê.

### Neteweyên Yekbûyî jî Tirkîye neheq dît

Koma Xebatên li ser Girtinên Keyfî ya NY'ê girtina Günay Aslan, Haluk Gerger û Cigirê Serokê IHD'ê Sedat Aslantaş wekî karekî keyfî û bêhiqûqî nixand. Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (AI) jî xwest ku hemû sûcdarên bir û bawerîyan bînin berdan. AI'yê dosyaya van kesên di 1994'an de şandibû vê koma NY'ê. Komê ev biryara xwe diyar kir û rexne li qanûnên ne-demokratîk jî tê girtin.

### Wê dergistî jî tazmînatê bistînin

Dewlet êdî wê tazmînatê bide dergistiyên kuştîyên şer jî. Dergistîya Assubay Tuncay Kocabaş Halime Akkuşê ji bo tazmînatê, li dewletê doz vekir. Dadgeha İdarî ya Bilind a Leşkerî daxwaza Halime Akkuşê di cih de dît, ser de jî biryar da ku dewlet tazmînatê bide zirxişk û zirbirayên kuştîyan. Tuncay Kocabaş li Çermûka Amedê hatibû kuştin.

# Çar alî zevî û daristan bûn gundê Serdê

Navê 5 kesên ku di xaçepirsa hejmara 39'an de peyva veşarî 'XEMILANDIN' dîtine û kaseta DİLŞAD "Awazê Kurdî" qezenc kirine:

**Eyüp Demir Ankara**

**Necmettin Balıkcı Mersin**

**Gülân Eker Amed**

**Nezir Gelmez Mêrdîn**

**Rohat Neçîrvan Niğde**

Serdê, gundê Hênê ya ku bi ser Amedê ve bû. Çar aliyên wê zevî û daristan bûn. Zeviyên Serdê 70 hezar domîm bûn. Di van de gundiyan pîvaz firengî, bacan, îsot, zebeş, petêx... diçandin. Di baxçeyê gund de gûz, sêv, aloçê... hebûn. Rezê gund jî gelek bûn. Gundiyan debora xwe bi van zerzewatan dikirin.

Serdê 110 mal bû. Gundî, ji ber zilm û zora leşkeran, sala 1994'an bi tevahî koçber bûn. Îro jî li Amedê dimînin. Bi koçberbûnê aboriya wan ketiye tengasiyêke wisa ku 3-4 mal ketine xaniyekî. Lê dîsa jî di bêjin: "Îro çiqas em di astengiyê de bin jî em li ser şerefa xwe mane. Heke em li gund bimana, diviyabû em bibûna cerdevan û me xwîna gelê xwe birêta. Lê me ev tişt qebûl nekir û îro jî ji bo vê yekê me dev ji gund berdaye."

Zilma leşkeran cara yekemîn li ser gundê

Serdê di 1992'an de çêbûye. Wê salê di mehên havînê de, gerîla li nêzikî gund kemîne datînin pêşiya panzêreke leşkerî û çend leşker tîn kuştin û hinek jî bi-

Ji van İsmail Sevinç, Muhittin Sevinç û Ahmet Çiçekdağ tîn girtin. Ew hê jî di girtigihê de ne.

Piştî vê kemîne zilm û zora leşkeran li ser

Husênê Mamo wisa dibêje: "Gundê me gundekî şên bû. Zerzewatê ku li gund çêdibûn tîrî bajarekî dikirin. Salê 2 hezar û 5 sed ton pîvaz, 5 hezar ton firengî, ba-

Ew dibêje ku çar aliyê Serdê jî daristan e. Daristanên ku bi navê Dibûr, Binê çiyê û Qışa tîne naskirin jî ji aliyê leşkeran ve hatine şewitandin, bi hinceta ku "gerîla di nav van daran de xwe vedîşêrin"

Berî mehekê leşkeran xaniyên gund jî şewitandin. Hinceta leşkeran dîsa jî eynî bû: "Gerîla di van xaniyan de dijîn." Gundî jî wisa dibêjin: "Piştî ku em ji gund derketin, em her sal di mehên havînê de diçûn gund. Me zeviyên xwe diçandin. Lê îsal di meha adarê de dema ku em herin gund, leşkeran nehiştin. Traktorên Hüseyin Keskin û Hüseyin Sümbül şewitandin. Dîsa jî em çûn me hinek zeviyên xwe çandin. Leşkeran ji bo ku em neçin gund xaniyên me şewitandin. Tevî vê kirinê jî em dev ji gundê xwe bernadin û kengê be ji emê veşerin gund."

HAYRETTİN ÇELİK



Bi hezaran gundên wekî Serdê hene li Kurdistanê.

rîndar dibin. Piştî vê leşker diavêjin ser malan û 5 gundî li ser îdiaya ku "bi gerilayan re alîkari kirine" tîn girtin.

gundê Serdê kê nabe. Ji ber zilm û zora leşkeran gundî bi tevahî koçber dibin. Yek ji van gundiyan

can, îsot û hwd. me diçand. Tenê vî zerzewatî tîrî bajarekî dikir. Lê îro em bi zorê kiloyek fren-gî ji xwe re distînin."

**XAÇEPIRSA BIXELAT (39)**

E	H	R	Î	M	E	N	Q	Î	Z
M	O	N	A	L	Î	S	A		
Ç	Ê	M	M	A	Î	M	A	N	
D	A	N	Î	Ş	Î	N	R	A	
D	Ê	I	K	N	M	Î	R		
X	A	V	R	M					
K	A	N	Î	M	Â	S	Î		
N	Î	N	O	V	A				
V	Î	N	R	E	H				

PEYVA VEŞARÎ → X E M I L A N D I N

**XAÇEPIRSA BIXELAT (41)**

.....Wanli (wêne)	Newal	Sembola ziv	Herfek	Navê herêmekê	Kar
Manî	Qemç, boç	Qertafeke neyîniyê	Navê mehekê	Beyreq	
				Nijadek	
				Zana	
İmam			Pîrozgeha ezidiyan		
Parçe					
			Rengek		Daçekek
			Teyrikek		Di muzîkê de notayek
Bêav		Navê tîpeke balefirê	İrq		
Genim dihêre			Rêzan		
	Haywanek			Ji şîrê pêsîm çêdibe	
	Haywanek				
Serçekî kurdan					Hanza
Sarekî fransîz					
				Qertafeke neyîniyê	
İşaret		Jêderka avê			
Tolan					
		Qaf			

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8 9

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tîn belavkirin. Xelata hejmara 41'an; kaseta Koma Çiya "Dilana Bê Sînor" e.

**Xelata Xaçepirsê**

Kasetaya Koma Çiya "Dilana Bê Sînor"

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

# Amerîka dixwaze Başûr bike warê kontrayan

Ji 9'an heta 11'ê gelawêjê KDP û YNK di bin siwana Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) de, li Dublina Îrlandayê li hev kom bûn. Di vê civînê de protokolek hate şanavkirin da ku şerê birakuji were rawestin. Li aliyê din jî Tirkîyeyê bi berpirsê xwe li vê derê amade bû. Di wan du mehên dawiyê de dewleta Amerîkayê polîtîka xwe li ser kurdan û Iraqê bi tempoyeke nû didomîne. Hesan Al-Mejid, mirovê Sadam Huseyn, bi destgîrî û rêxistina CIA'yê ji Iraqê derketiye û niha Qiralê Urîdînê Huseyn, piştgirtiya Amerîka û Îsraîlê dike û li dijî Sedam derdikeve. Nêzikî 1400 leşkerên Amerîkayê yê taybet nû çûne Kuweytê. Her wiha niha nêzikî 3500 leşkerê Amerîkayê ketine rê da ku cihê xwe li Urîdînê bigirin. Ev nûçeyên nû, gelşa kurdan bi ku ve dibe û girêdahiya wan bûyeren bi hev re çî ye?

**Divêt li gorî Amerîkayê dîktatorek here û yekî dinê were. Yek ji wan berendamê dîktatoriyê li Iraqê belkî lawê Sadam Udayî be jî. Yê dudiyar jî Hasan Al-Majid e.**

yeke didome û birakuji li başûr Kurdisanê ji sala 1946'an ve bi damezîrandina PDK-Iraqê ve li ser rojevê ye. Lê çima di wan du mehên dawî de Amerîka bi kotek û dijwarî li ser Başûr û şer-rawestîne karê xwe dimeşîne? Di wî şerê dawî de, di navbera KDP û YNK'ê de zêdeyî 1200 pêşmerge hatin kuştin. Serokê KNC'ê (Kurdish National Kongres-Kongra Neteweyî ya Kurdan) li Amerîkaya Bakûr, Dr. Nejmîtin Kerîm li ser wî şerî wiha dibêje: "Heke mirov li wî şerî temaşê bike, bêguman, divêt were gotin ku wekî PDK û YNK kurd kuştine, Sedam kurd nekuştine. Her du kom jî li ser navê Kurdisanê "şer" dikin, lê peywendiya konevaniya wan bi Kurdisanê re nîn e." Berpirsê YNK'ê Berhem Salih, li Amerîkayê bi John Hollbrook re, ku di Wezîriya Derve de kar dike, axivîye û Hollbrooke şer-rawestîna di navbera PDK û YNK'ê de xwestiye. Hollbrook li a-

liyê dinê jî bi her îmanên xwe li gel dewleta Tirkîyeyê û li dijî gelê kurd li Bakur derdikeve. Holbrook bi xwe li hemû dewletên Ewrûpayê geriya da ku ev dewlet zêdetir alîkariya Tirkîyeyê bikin. Holbrookê li Bakur jî ji bo qirkirna gelê kurd bê deng dimîne û dipejirîne û Başûr mirîna kurdan "naxwaze". Ma ev mirovahî ye? Bêguman dewleta Amerîkayê her dem konevaniyeke berjewendî ji bo interesa xwe meşandiye. Lewre jî ku îro dewleta Amerîkayê şer-rawestîna di navbera PDK û YNK'ê de dixwaze, ne ji bo kurdan e. Hesan Al-Majid û malbata xwe bi xwe mirovê Sadam in û bi her cureyî qirkirin li dijî gelê kurd û ereb meşandine. Hem Sadam û hem Hasan Al-Majid wekî hev in û bi her awayî li hemberî mirovatiyê tawandar in. Lê dewleta Amerîkayê, CIA, bi xwe bi Hesan Al-Majid re ne û ew dixwazin wî li dijî Sadam bikin serokê muhalefetê. Di nav vê muhalefetê de kurd jî wê cihên xwe bigirin. Li gorî hin pisporên Amerîkayê dewletên Ewrûpayê bi taybetî Almanya, Fransa û Rusya politikayên Amerîka napejirînin û li



Amerîka ji bo ku cihê Sadam tijî bike, li dîktatorekî nû digere.

gorî berjewendiyên xwe polîtîka dimeşînin. Pir dewlet bi dizî mal didin rejîma Iraqê û her wiha ambargoya li dijî Iraqê welê der dikevin. Têkiliyê PKK'ê operasyonê gelê kurd û ereb bi xwe xîtinim. Lê ev îşxalkirinê ambargoyê de bîçî û bêmecal dimînin. Dewleta Amerîkayê naxwaze ev sazûman niha li Iraqê (Status Quo) were guhartin. Ji lew re divêt li gorî Amerîkayê dîktatorek here û yekî dinê were. Yek ji wan berendamê dîktatoriyê li Iraqê belkî lawê Sadam Udayî be jî. Yê dudiyar jî Hasan Al-Majid e.

van Kathryn Porter wiha dibêje: "Dewleta Tirkîyeyê di 6'ê pûşperê (hezîran) de Kurdistana Başûr îşxal kir û got ez li dijî PKK'ê operasyonê gelê kurd û ereb bi xwe xîtinim. Lê ev îşxalkirinê esas ne li dijî PKK'ê bû. Bi vê operasyonê dewleta Tirkîyeyê çekên giran ji bo PDK'ê birin Kurdistana Başûr. Mirov dikare eşkere bibêje ku peywendiyên dewleta Tirkîyeyê, Barzanî û Sedam bi hev re hene."

na serokên mezin ên CIA'yê û parastina Nete-weya Amerîkayê li gel Hasan Al-Majid û hwd. diyar dikin ku Amerîka di rojên pêş de wê zêdetir li ser Iraqê raweste û hinek tişt jî bo Iraqê û pir tiştên negatîv jî bo gelên kurd çêbin. Agahdariyên ku me bi dest xistine nîşan didin ku di dawiyê de dewletên împeryalîst wê li Başûr cepheyeke kontra li dijî têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdisanê wekî li Nikaragwayê, biafrînin. PDK û YNK ketine nav komployeke mezin wekî sala 1975'an ku MeleMustafa Baranî têk çû. Barzanî û Telebanî vê carê ketine nav politikayêke navneteweyî. PDK û YNK di nav wan taktîk û stratejiyan de û di lîstika stratejî de Barzanî û Telebanî bêguman tenê peya ne.

DARA AZADÎ  
WASHINGTON

Wekî tê zanîn kapîtalîzm, piştî demekê digihîje qonaxa împeryalîzmê. piştî vê qonaxê jî dawî li jiyana wê tê. Kapîtalîzmê pir tiştên baş û pêşketin, ji bo mirovahiyê gelek şiyarbûn bi xe re anîne ser rûyê dinyayê. Yek ji wan çêbûna neteweyan e. Di dema berî kapîtalîzmê de netewe tune bûn û pê ve girêdayî çand, edebiyat, urf û edetên neteweyî pir kêr hebûn. Her wiha jî pir gel hatibûn parçekirin û di bin cure cure otorîteyan de dijîn. Yanî li gorî dema feodalîzmê û ya berî feodalîzmê kapîtalîzm sistemeke gelek baş bû ji bo mirovahiyê. Bi çend gotinan mirov nikare çeyî û xerabiyên wê jî bîne zimên. Lê belê tiştê heye ku mirovahî lazim e bizanibe û li gorî wî tiştî jî xwe biparêze. Belê, dema ku em tê de

## Rewşa cîhanê û emperyalîzm

dijîn merheleyek e ku papaloka dawîn a kapîtalîzmê ango gihîştîye rojên xwe yê mirinê. Ev dem di jiyana kapîtalîzmê de dema herî bi xeter e û di vê demê de parastina mirovahiyê zêdetir pêwîst e. Roja îro meşandina polîtîkaya cîhanê di destê împeryalîzmê de ye. Bi çî awayî bixwaze, wilo dide meşandin û naxwaze kesek li hember wê derkeve. Împeryalîzm çiqas mezin dibe û di nav salan de diçe, ew qas jî har dibe, çiqas har dibe ew qas jî li hemberî mirovahiyê gunehkar dibe. Ev jî dibe sebebê xelasbûna jiyana wî. Dema tê gotin, "împeryalîzm" em di serî de Amerîka û Awrûpayê tînin bîra xwe. Bi rastî jî împeryal-

istên herî mezin û yê di çîhenê de xwediyê soz ev her du ne. Di serê qîma 20'an de bi kamilbûna kapîtalîzmê netewe hatin çêkirin û yê berê hatibûn çêkirin jî xurt bûn. Di vê demê şerekî taybetî dest pê kir û cîhan jî nû ve hate parevekirin. Lê belê ev parevekirin ne parvekirineke wekî ya dema feodalîzmê bû, ev zêdetir bi sîstem û polîtîk bû. Li aliyê ev parevekirina han, ji bo mirovahiyê hê zêdetir bi tehlîke ye. Ji ber ku armanc ne parçeyekî cîhanê ye, di her derê de yek polîtîka dixwaze were meşandin. Heya sala 1945'an împeryalîzmê polîtîka xwe diyar kir û bi şerê dudiyar yê cîhanê da der. Li Ewrûpayê faşîzma Hitler bi hemû

hêzên xwe li hemberî mirovahiyê şer meşand. Di nava deh salan de bi milyon mirov hatin kuştin. Lê hêzên ku di nav armanca wan de parastina mafên mirovan hebûn, meydan jê re bexwedî nehiştin. Di nav demeke pir kurt de serî li faşîzmê hate pelçiqandin. Roja îro em dinêrin faşîzmeke nû serî li cîhanê radike. Ev car, bi destên Amerîka û çend dewletên Ewrûpayê faşîzm dixwaze xwe li hemberî gelên bindest bide meşandin. Di metodan de guherîn hebe jî di navbera faşîzma 1945'an û ya nû de zêde cudayî tune ye. Pratîka ku polîtîka împeryalîzmê pê tê meşandin di herêma rojhilata navîn de, û bi taybetî li hem-

berî gelên bindest ên wekî gelê Kurdisanê, baş dide xuyakirîna ku xeterên li dijî mirovahiyê hê zêdetir in ji yê sala 1945'an. Dîsa, polîtîka ku împeryalîzm di herêma Balkanan de dide meşandin jî ne ji ya Hitler kêmxetertir e. Di van herêman de pir bi şeweyekî qirêj polîtîka tê meşandin. Mirovên hinek bêxwendin û polîtîk wisa fêhm dikin ku Amerîka û Ewrûpa piştgiriya gelê kurd dikin û ji wan re serkeftinê dixwazin. Lê mixabin rastî ne wisa ye. Serkeftina gelê kurd û Kurdisanê tirseke zor girîng e di dilê împeryalîstan de. Ji ber ku serkeftina gelê kurd ne bi cureya ku ew dixwazin pêk tê. Ev serkeftin wê bibe rêber ji bo hemû gelên bindest li herêma cîhanê.

AMED BOTAN  
MOSKOV

# FAL



**BERAN** (21 Adar - 20 Avrêl)

Ev demek e ku nexweşî dev ji we bernadin. Lê ev ne ji bêşansiya we ye, ji îhmalkariya we ye. Hûn hay ji siheta xwe namînin. Ji bîr nekin ku, malê dinyayê tev yê mirov be ji dema mirov bêsihet be tu qîmeta wan nîn e.



**GA** (21 Avrêl - 21 Gulan)

Êdî dev ji vê bêmemnûyeta xwe berdîn. Hûn tu tişt û tu kesî li derdora xwe naecibînin û wan rexne dikin. Lê ev yek we, ji dost û hogirên we dûr dixê. Ji bîr neki ku, birîn xwediyê xwe diêşîne.



**CÊWÎ** (22 Gulan - 21 Pûşper)

Êdî ji asîman werin jêr û pêlî erdê bikin. Hûn li dinyayê dijîn, ne li bihuştê. Rastiya xwe bibînin û li gorî راستiya xwe gav dakin. Gotina, aş bi çeqçeûqûkan namesh bila her tim di bîra we de be.



**KEVJAL** (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Ev hefte di jiyana we de guherînên nû wê çêbin, xwe ji van guherînan re amade bikin. Fersendên bi vî rengî her car dernayên pêşiya mirov. Wan baş binîrxînin û ji wan encamên erîni derînin.



**ŞÊR** (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Van rojan mala we mêvan kêr nabin. Mêvanek tê, yek diçe. Hûn ji bo qedr û qîmetê bidin wan, çî ji destê we tê hûn dikin. Rewşa aboriya we van rojan ne baş e, lê mêvan tê, risqê wî beriya wî tê. Wê ji derekê ji we re pere werin.



**SIMBIL** (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Hûn ji xwendina pirtûkan gelek hez dikin. Êdî ev ne hezîkirin, zêdetir evîn e. Carinan hûn ji xwe re dibêjin: "Ji berdêla kuştina pirtûkeke baş, mirov peyayekî bikuje çêtir e. (Miltan) Lê dibe ku, her kes di vê yekê de ne bi we re be.



**MÊZÎN** (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Cot bi gayê pîr na be. Hûn jî dev ji tiştên paşverû berdîn. Dinya, ji aliyekî ve dizivire û ji aliyê din ve jî diguhere. Divêt hûn jî xwe nû bikin. Roj roja guherîn û cesaretiyê ye. Vê yekê qet ji bîr mekin.



**DÛPIŞK** (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Dev ji vê serhişkiyê berdîn. Rastiyan qebûl bikin. Ev çî hale? Bi vê yekê hûn nikarin tu tiştî bikin, hevalên we rastiye ji te re nîşan didin lê dîsa tu bi ya xwe dikî. Rastiyekek heye, ma Şam dû re qey mişar jî dûre?



**KEVAN** (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Hay ji gotinên xwe hebin. Gayê we gotina devê we nebihişe. Şûna xerçeran xweş dibe, şûna xeberan xweş nabe. Ji bîr nekin, bi gotinekê dilê mirov dimîne, bi sed gotinan dilê mirov çênabe.



**KARIK** (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Ev demek e hûn bûne agir û li derdora xwe dibarin. Tiştên wekî serê derziyê, hûn dikin wekî çiyayekî. Dev ji vê bêhtengiya xwe berdîn. Binêrin bi qehrê re aqil jî difire û diçe (Lessing).



**DEWLIK** (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Êdî dev ji deynan berdîn. Deyndarî ne tiştê baş e. Her çiqas di gotinên pêşiyê tirkan de "Deyn qamçiyê mêran e" jî tê gotin, lê divê ev yek tim di bîra we de be ku deynkirin ji parsekîyê ne durtir e.




**MASÎ** (20 Reşemî - 20 Adar)

Hûn di rewşeke gelek dijwar de ne. Lê jê qet netirsîn. Hûn bi vê niyetê û xebatê, di demeke kurt de dikarin bi ser bikevin. Agir zêr, xîzani jî mirovên mêrxas diceribîne. Ev ji bo we îmtihanek e.

## Çêlika Qirakê

Rojekê yekî Sûrgicî gava ku ji bajêr vedigere, li kêleka rê bacaneke reş dibîne, lê dinêre nanêre tiştêkî jê fêr nake. Radibe bacanê dixê paşila xwe û bi xwe re dibe gund û nîşanî gundiyan dide. Lê gundî jî tiştêkî jê fêr nakin. Naçar dibin û berê xwe didin cem jîrik. Jîrik jî bacanê di nav destên xwe de dibe û tîne, ew jî tiştêkî jê fêr nake. Li ser vê yekê dikene û ji gundiyan re dibêje: "Gazî kurê min yê biçûk bikin." Gundî gazî kurê wî yê biçûk dikin û kurik tê. Bavê wî bacanê dirêjî destê wî dike û dibêje: "Ka ji me re bibêje bê ev çî ye?"



Kurê jîrik, radihêje û di nav lepê xwe de dizivirîne û paşê vedigere ser bavê xwe "Yabo, ev çêlika qirakê ye, lê hîn çavên wê nebişkivîne" dibêje.

Li ser bersivê jîrik li gundiyan dizivire û dibêje: "Bi xwedê min jê re negotibû, wî ji ber xwe pê derxist."

**BERHEVKAR:**  
Î. OMERÎ

## Serpêhatiya Remoyê mitirb û kumandar

Li gundekî Misircê, li bin Pira Reşê hin malên mitirban konên xwe vevegirtibûn. Rojekê bi elenda sibê re seyên wan direyin û ranawestin. Naçar, ji nav nivînan radibin û gava ku li derdora xwe dinêrin, dibînin ku leşkerê Romê ew dorpeç kirine. Leşkerê Romê mêran tev li ser Pira Reşê kom dikin û yeko yeko daxwaza nasnameyan ji wan dikin. Pa

mitirb in, çu nasname bi wan re nîn in. Vêca, kumandar yek bi yek ji wan dipirse: "Sen nerelîsin?"

Her yek li gorî xwe bersivê dide. Her wisa dora Remo tê. Kumandar jê dipirse: "Adin ne?" Remo jî bi wê tirkiya xwe ya "çiyayî" wiha dibêje: "Adinizi Remoleri kumandar beg." Kumandar: "Sen nerelîsin?" Remo jî tilya xwe ber bi konan ve dike

û: "Kumandar beg, ben burda dilîsim" dibêje.

Her wisa dora biraziyê Remo tê. Kumandar gava ji biraziyê Remo re "sen nerelîsin", dibêj berî ku biraziyê wî bersiva xwe bide, Remo bi tilîkê, vê carê konê ji yê xwe wê vetir nîşanî kumandar dide û "Oda jî ji min wir de tir dilîse." dibêje.

**RONÎ ZINAR**

## Seyda û bihuşt

Li devera Botanê seydayê gundekî, ji çûn û hatina Lgerflayan ne xweş bû. Çî dema ku gerîla bihatana gund an jî ji gund derketibûna, hîç carekê di navbera wan û seydayê gund de ne bixêrhatin, ne jî xatirxwestin çênedibû. Her wisa rojekê gerîla li baregehê xwe ne û dibînin ku seydayê gund tê li cem wan rûdine. Piştî bixêrhatinê û bêhnvedanê yê fermanîdar ji seyda re dibêje: "Te xêr e seyda. Vê kelekela

havînê û vê nivroja han te berê xwe daye çiyê?"

Seyda bi dengêkî perîşan dibêje: "Şeva çuyî min xewnek dît û çawa ez ji xew rabûm min xwe li Xwedê û li we girt. Min di xewna xwe de didît ku ez miribûm. Piştî hesab û kitêban, biryar hate dan ku ez herim bihuştê. Bes Pira Siratê li pêşiya min mabû. Min ew jî derbas kir. Bi dilekî xweş û tena, min berê xwe da bihuştê. Lê, gava ku ezê di derî re derbas

bibim, dengêk hat min ku dibêje "raweste." Gava ku ez zivirîm min dît ku Apo ye, defter û qelama wî jî di dest de ne. Deftera xwe vekir û got: "Ka ez binêrim bê te li dinyayê ji bo gelê xwe çî kiriyel?"

Apo li defterê nihêrî ku min ji bo gel tiştêk nekiriye, hema sîleyek li bin guhên min xist û ez ji xew vecinîqim. Ji vir û pê ve jî hûn dizanin..."

**GELÊRÎ**





Sekreterê PYDK-Sûrî Îsmâil Emo, ji rojnameya me re dilê xwe vekir û peyivî:

# '150 hezar kurd ji mafên hemwelatîyê bêpar in'

**Îsmâil Emo, Sekreterê Partiya Yekîtiya Demokrata Kurd li Sûriyeyê, xwediyê fikrinen cihêreng e li ser rewşa kurdên Sûrî. Bi mebesta hînbûna fikrên wî, em vê hevpeyvîn pêşkêşî we dikin.**

**K**ongreya Karwanê Yekîtiya Welatparêz, em hevîdar in hûn ji xwendevanên me re çawatiya damezrandina partiyê şirove bikin û di bin çî merc û hoyên rêzanî de partiya "YEKÎTÎ" yê ronahî dîtiye?

- Partiya me, Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê ji yekbûna sê rêxistinên kurd hatiye pê (Partiya Palan a Demokrata Kurd li Sûriyê, Partiya Hevgirtina Gel, Partiya Demokrata Kurd a Yekbûyî li Sûriyê).

Partiya me, kongreya xwe ya yekîtiyê di bihara sala 1993'yan de girê da. Ew kongre ku baweriya yekbûnê piştî zincîreke dirêj ji veqetandin û parçebûna di tevgera netewiya kurd de li Sûriyê bi ser xist, nemaze piştî têkçûna yekîtiya pêşîn a ku di sala 1970'an de çêbûbû.

Ew rewşa parçebûnê ya di laşê tevgera kurdî de, gihîştibû asteyekê (sewiyeyekê) ku tu pêdiviyên welatparêz an neteweyî ew ne dipejirand û ne jî tu mentiqê rêzanî û ramanî. Em jî bîr nakin ku cemawerê (girse-kitle) me ya kurdê welatparêz, roleke erênî û girîng di alîkariya yekîtiyê de leyist, ji ber ku vê cemawerê hevîyên xwe di hebûna partiyeke mezin de didît, partiyeke ku bi kar û xebata xwe xuyayî be, di wergirtina biryarên xwe de serbixwe be û jî ber baweriya cemawerê kurd bi çûna bêveger a dema partiyên biçûk. Her wiha, jî ber armancên miletên me jî hêz û xurtbûnê pê ve bi tu tiştên din nayên pê û ev hêz û xurtî, berî her tiştî yekîtiyê gerekê wê ye. Rewşa guhertinên rêzanî

di deverê û di cihanê de bandoreke erênî li ser yekîtiya me hebû.

Di bîr û baweriya we de, kî berpirsariya vê xemgiriya rêzanî ye ku milet jê digazine, ew ne hiştiye ku tu karên erênî, rêzanî û demokrat di tevgera kurd a li Sûriyê de çêbibin?

- Cemawerê kurd li Sûriyê gelekî ji veqetandin û parçebûnan, dilsar û dilteng bûye û nema baweriyê bi wan hawên kar ên kevin tine. Dibîne ku karê rêzanî û demokrat ew e riya bi tenê ya ku armancên miletê me yê kurd li Sûriyê, di çarçoveya merc û hoyên wî yê berbiçav de, dê pêk bîne.

Doza kurd li Sûriyê di naveroka xwe de dozeke welatparêz û demokrat e, ji ber wilo jî xebateke rêzanî û demokrat jê re divê, armanca wê xebatê danasîna gelê Sûriyê-se-rûber- bi hemû partiyên xwe yê welatparêz, bi dadmendiya doza kurdî û rewabûna hebûna tevgera welatparêziya kurd li Sûriyê be û pêdiviya bidestxistina mafên neteweyî yê rast û rewa yê miletê kurd di çarçoveya yekîtiya welêt de be.

**Ma gelo li ser tevgera kurdî li Sûriyê hatiye nivîsandin ku di tenahiye de bijî û di raman û rêzana xwe de bibe dîvik ji parçeyên din re? Ta kengî dê bimîne pir ji tevgera kurdî ya parçeyên din re, di ser re derbas bibin?**

- Em dikarin bibêjin tevgera me di tenahiye de dijî, lê ev peyv ne gelekî di cih de ye, ji ber ku tevgera me ya kurdî li Sûriyê jî xwişkên xwe yê parçeyên dîtir, bêhtir dixwaze tîkiliyên xwe yê Kurdistanî kûr û firehtir bike, lê tim tê xwestin ku ew tîkiliyên rengê dîvîtiyê bistînin. Ew jî gelek sedemên wê yê dîrokî hene, vedigerin mercên ku yekemîn rêxistina kurdî tê de hatiye damezrandin. Hin jî wan sedeman jî atîfî ne, jî ber bandora şoreşên Kurdistana Başûr û ya Bakur li ser îşê cemawerê me û em dikarin bibêjin qelsiya tevgera kurdî li Sûriyê û xwe



Sekreterê PYDK Îsmâil Emo

xurtkirina wê bi parçeyên ku şerê çekdariyê dikin, bi xwe jî yek ji wan sedeman e.

Ji bilî van sedeman jî hin jî partiyên Kurdistanê pêçiyên xwe dixine nava miletê kurd li Sûriyê û wan bi xwe ve girê didin, da ku wan di destên xwe de bikin pelikeke bi nirx jî bo berjewendiyên xwe, an jî bo wergirtina alîkariyê. Gelek caran dewleta Sûriyê bi alîkariya hin partiyên Kurdistanê xebateke mezin di ber wê yekê de dike, ku berê miletê me jî doza wî ya bihgehîn biguhêre, berê wî bide pişt sînorên heyî, da ku miletê me bixapîne, her wekî doza vî miletî ne li dewleta Sûriyê ye, lê belê li Tirkîyê an li Iraqê ye. Ji ber dewleta Sûriyê siyaseteke şoven li dijî gelê kurdî bi kar tine û wî wekî mişextiyar dibîne, ne wekî mileteki li ser axa bav û kalên xwe dijî.

Ji dema damezrandina tevgera kurdî li Sûriyê sala 1957'an ve, ev

tevger dozê li karbidestên Sûriyeyê, yê ku li pey hev hatine kirin, ji bidestxistina mafên miletê kurd li Sûriyê (rêzanî-civakî-çandî) ma gelo we tu wefdên (delege) partiyên wan ên gelêrî şandine ba berpirsiyarên dewletê, yan we tu erize di vî warî de pêşkêşî wan kirine?

- Sala 1965'an wefdekî kurdî ji parêzgeha El-Cezîrê, jî bo rakirina encamên ser jimartina awarte ya ku li wê parêzgehên pêk hatibûn û jî dehhezaran welatîyên kurd ji mafê wergirtina nasnameyê bêpar mabûn, berê xwe dabûn Şamê.

Her wiha parlementerên kurd (Nûnerên Têvgera Welatparêzî ya kurd) ên sala 1990'î hin berpirsiyarên dewletê jî bo wê armancê li Şamê dîtibûn. Wefdekî gelêrî jî erîzek bi 13000 îmzeyên kurdên bînfûs bi wan re gelek berpirsiyarên dewletê dîtin. Dîsa jî bo wê armancê, sala 1990'î bêtirî 60 kesî, xwe li pêşiya

Koşka Komarê li Şamê dirêj kirin, wergirtina nasnameya Sûriyê xwesteka wan bû.

Dîsa di warê xebata tevgera kurdî de li Sûriyê, par wefdek ji her pênc partiyên hevbendîya kurdî û partiya me, jî bo dîtina serokkomarê Sûriyê û şirovekirina daxwazên tevgera kurdî hewl dan, lê karbidestan rê nedan ku ew dîtî çêbibe, ew nûner rabûn nameyeke dirêj li ser rewşa gelê kurd bi riya postê re jî serokkomar re şandin.

Ji alîkî ve dewleta Sûriyê dibêje ez dewleteke demokrat im û mafên mirovan li cem min parastî ne. Ji aliyê din ve jî bi dehhezaran kurdên welatîyên xwe ji mafê wergirtina nasnameyê li gorî qanûneke stemkar, bêpar dike. Hûn dikarin li ser vê qanûna ser jimartinê û bandora wê li ser kurdan bipeyivin?

- Di roja 23.8.1962'yan de, Serokkomarê Sûriyê (mersûmê) nimre 93 derxistîye, jî bo pêkanîna hejmartineke awarte ji mirovên parêzgeha El-Cezîrê re ku piraniya rûnêştvanan jê kurd in -xwedêgiravî wê pê rewşa xalkê Cezîrê zelal bikin, ên biyanî û bazdayî dê bêne naskirin- lê wekî me got, bi dehhezaran welatîyên kurd ji nasnameya xwe ya Sûriyê jî sala 1957'an ve, yê kurd, Tewfîq Nîzamedîn di listeya bînfûsan de hatibû!! Lê wê demê, berpirsiyarên dewletê bi lez heftiketiya xwe weşartin û nasnameya wî lê vegrandin.

Îro, hejmara kurdên bînfûs bêhtirî 150 hezar mirovî heye, ew jî mafên karkirina li ba dewletê, xwandina bilind, derketina ji derve, razana hotêlan bêpar in. Her diçe, hejmara van belengazan pir dibe. Bi rastî ne me dîtîye û ne jî me bîhîstîye ku di cihanê de rejîmek bi vî rengî dan û standinê bi welatîyên xwe re dike. Kurdên bînfûs jî neçarî di warê aborî, civakî û çandî de li paş mane, çimkî bînfûsî jî wan re bûye kelemeke mezin û di riya pêşveçûna wan de serî hilda-

ye. Ji bona berdana girtiyên kurdan ên siyasî bi geleperî û girtiyên partiya we bi taybetî tu hevkarî di navbera we û rêxistinên navneteweyî de hene, nemaze Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî?

- Her dem, em ji bo danasîna doza gelê xwe bi raya giştî û rêxistinên navneteweyî re kar dikin û em guhdaneke taybet li girtiyên welatparêz ên kurd, ên ji ber kar û xebata partiya me zîndan bûne, dikin. Hejmara girtiyên jî bo wan karên partiya me jî sala 1992'yan ve gihişte dora 200 kesî. Û ta roja îro 20 girtî di zîndanên Şamê û Helebê de hene. 9 ji wan bi sê salan hatin zîndankirin, lê hê yê dîtir pêşkêşî dadgehên nebûne û 15 girtiyên din bi şeş mehan ta du salan mahkûm bûne û cezayê xwe di Zîndana Edra û zîndana beşa îstixbarata derve de borandine.

**Li ser hîlbijartinên parlamentoya Sûriyê û yê belediyê û bêparkirina %10 ji welatîyên Sûriyê ji mafên beşdarî û hebûnê di parlamentoyê de û kirinên dezgehên dewleta Sûriyê di dema hîlbijartinan de helwesta partiya we çî ye?**

- Partiya me digel partiya El-partî û partiya demokrat a pêşverû, di yek listê de, di firmeha sala 1994'an de li parêzgeha Elcezîrê, beşdarî hîlbijartinan bû. Li parêzgeha Helebê partiyên kurdan jî ber kirinên ne demokrat, xwe bi tevayî jî bal dezgehên dewletê ve û jî hîlbijartinan vekişandin. Tevî ku lista kurdî di Cezîrê de hejmarinen bilind jî deng wergirtibû jî, dewletê bi darê zorê lista kurdan şikandin û ya partiya Bas û dîvikên wê bi ser xistin. Bi vî kirê, ew quncika biçûk ji demokratiya ku sala 1990'î hebû, hate tunekirin û jî ber van sedeman partiya me biryar bi qutbirîna jî hîlbijartinan stand. Partiyên kurdan beşdarî hîlbijartinên belediyê yê di reşemiya (sibata) 1995'an de çêbûn, nekirin.



Tiştê ku îro dewleta Tirkîyê di Kurdistana Bakur de dike, di warê valakirina gundên kurdan de, rengêkî ji rengên Zînarê Erebî ya ku dewleta Sûriyê li Kurdistana Sûriyê pêk aniyê. Zînarê Erebî çi ye?

- Dawiya sala 1973'yan û destpêka sala 1974'an, dewleta Sûriyê gelek el û eşîrên ereban ji parêzgehên Reqayê û Helebê anîne Cizîrê û ji wan re li dora 40 gundên modern, di seranserê sînorê Sûriyê û Tirkîyeyê de, bi dirêjahiya 300 km'yî û firehiya 10 km'an ava kirin. Başîrîn erdê çandinê ji destên kurdan derxistin û li wan biyaniyan belav kirin, armanca dewletê ew e ku dîwarekî di navbera lawên mîletê kurd de, li herdu aliyên sînor bête hildan û ji aliyê dîtir ve jî guhertineke demografî neteweyî têkeve parêzgeha El Cezîrê.

Hûn hişmendîya iqlîmî û ramana pratîk a karê rêzanî û çekdariyê di Kurdistana de çawa dibînin? Gelo tu berjewandiyên tevgera rizgarîxwaza Kurdistana de hene?

- Tevî ku em dibînin Kurdistana di warê dîrokê û cografiyê de ne parçekirî ye û ji mêj ve mîletê me yê kurd li ser axa bav û kalên xwe dijî. Lê li ber çavan e, îro Kurdistana bi sînorên siyasî parçekirî ye. Mîletê me yê kurd di her parçekî de bi miletekî re dijî, ne wekî wan mîletên parçeyên dîtir e, rejîma her parçeyekî ji ya dîtir cuda ye.

Ji ber vê yekê em dibînin, girîng e di her parçeyekî Kurdistana de tevgerêk taybet hebe û program û siyaseteke her tevgerêkî li gora merc û hoyên wî parçeyî be. Taybetiya rewşa her parçeyekî nabe sedema tunekirina têkiliyên biratî di navbera tevgerên Kurdistana de. Lê belê yekîtiya mîletê kurd a neteweyî û dîrokî dixwaze ku têkiliyên alîkarî û dostaniyê di navbera tevgerên Kurdistana de bîne peydakirin, lê divê ew têkilî li ser bîngeha rizgarkirina taybetî, xweseriya tevgera her parçeyekî bona avakina siyaseta xwe li gorî rewşa xwe ya taybet.

Hevparîya siyasî ya di navbera PDK û YNK'ê de, dema dewleta federal di başûrê Kur-



Sekreterê PYDK'ê Îsmail Emo û nûnerê me yê Sûriyê Fener Rojbiyanî.

distanê de hate çêkirin, dirêj nekir û nexweşiyek ket nava wan. Navê wê "birakuji" bû, gelo ev birakujiya malwêran hema bi tenê li ser eniya kurdan hatiye nivîsandin?

- Rehên birakujiya Kurdistana Başûr a di navbera PDK û YNK'ê de kevî in. Di bîngeha xwe de, vedigere dema piştî sala 1975'an. Agirê hevrikiya wan piştî çêbûna dewleta kurdî ya federal ji bona berjewandiyên partiyekê gurtir bû.

Her partiyekê di dilê xwe de dixwaze ku ew bibe partiya tek û ten, biryar di destê wê bi tenê de be. Divê em ji bîr nekin ku endam û berpirsiyarên Efwac Xeffî (koma cerdevanan) wek patoxwer û kirêdar dixebitin -hê jî wîlo dixebitin- ji ber dema agirê birakujiyê berdemem be her partiyek, dê bixwaze hejmareke mezin ji wan kirêdaran bi dana pereyên gelek, bi aliyê xwe ve binin. Her wiha dewletên derdora Kurdistana Başûr roleke pir gemar di geşkirina vî şerî de dilîzin û bîfediyê pêçiyên xwe xistinê.

Ma ji serkirdayetiya siyasî re ne çêtir bû ku problemên xwe di hundirê parlemena Kurdis-

tanê de bi şeweyên demokrat çareser bikirana?

- Yê ku ji bo xerakirina parleman dixebite, nakeve serê mirov ku ewê problemên xwe tê de çareser bikin, em helwesta wan parlementerên kurd ên di parleman de asê bûn û bi xurtî dixwestin bi riyên demokrat problemên çareserkerin dipesînin û serê me ji ber wan ve bilind e.

Di nêrîna we de gelo sedemên derbasbûna hêzên Tirkîyeyê xaka Kurdistana Iraqê çi ne?

- Dewleta Tirkîyê dixwaze ji xelkê re bide zanîn her wekî doza kurdî di Kurdistana Bakur de dozeke emnî ye, doza parastina sînor e, ji derveyî sînoran ve tê tevedan. Her wiha ji bo karên çekdarî yê îro di Kurdistana de dibin ji ber çavên raya kurdî û ya giştî veşêre û dixwazin bi van kirinên xwe çavên mîletê me bişkînin û bawariya wî bi azadî û rizgariyê hilweşînin. Ji aliyê din ve jî dixwazin tu pêşketin û aşî di Kurdistana Başûr de çênebe, da ku cemawerê kurd baweriya xwe bi yek carî ji fermandariya kurdî ya îro bikişîne.

Wekî hûn dizanin roja 12.4.1995 parlemenê kurdî li derveyî welêt dest bi karê xwe kir, helwesta we ji vê parlemânê çi ye û hûn çawa dibînin ku ev civat, wê bi kar û barên xwe yê tenê xwestin, rabe?

- Parlemana kurdî piştî têkçûna êrişa leşkeriya Tirkîyê li ser Kurdistana Başûr, di 12'ê avrêlê (nîsanê) de li Hollandayê çêbû.

Ew gav mîna daxuyanîyekê ye ji bo çêkirina rûwekî siyasî nû ku karibe rewşa gelê Kurdistana jî dezgeh û rêxistinên cîhanê yê demokrat re şîrove bike, rastî û dadmendîya doza mîletê kurd bide xuyakirin û ji aliyê din ve jî eger rojê dewleta Tirkîyê di bin bandora xwesteka navneteweyî de doza kurdî bi rengêkî aşî çareser bike, wê di guftûgoyan de bibe nûnerê kurdan.

Parleman tiştêkî baş e, em dibînin çêkirina wê gavek e erênî ye lê divê neyê ji bîrkirin ku ew parlamentoya hîlbijartî gerek e hemû rêzên civakî û rêxistinên rêzanî yê li Kurdistana xwe tê de bibînin û cih bigirin.

Berî demeke kurt serkirdayetiya PKK'ê ji bona rawestandina şer di Kurdistana Bakur de û dîtina çareserkerineke siyasî û demokrat ji doza kurdî re amedebûna xwe ji bo guftûgoyan bi dewleta Tirkîyê re diyar kir. Nêrîna we di vê gavê de çi ye?

- Armanca şerê çekdariyê ew e ku dijmin neçar bimîne û guftûgoyên demokart bipejir-

ne ji bo çareserkerina dozê bi riyeke aşî. Guftûgoyên demokrat îro bûne sembola vê dem û qonaxê. Di baweriya me de, banga PKK'ê ji bo rawestandina şer û xwestina guftûgoyên damokrat li dewleta Tirkîyê li gora dema îro ye, lingê dewleta Tirkîyê dixê soleke teng, siyaseta wê dixê astangê û li hemberî cîhanê nêrîneke pak dide gelê me û doza wî.

Wekî hûn dizanin, li Kurdistana û li derveyî Kurdistana, gelek tecrubên yekîtiyê û eniyên tîk çûn û bi ser neketin. Gelo ev jî serdestiya ramana leşkerî ser ramana rêzanî hatiye, peyan ji ber qelsiya rêzaniya kurdan hatiye?

- Dilsozî û pêşkêşkirina qurbanan bi tenê ji bo dozê di asteya dadmendîya doza kurdî de ne bes e. Lê divê hêzên xwediyên xwediyê vê baweriyê jî bibin. Ji ber wîlo çêkirina yekîtiyê û eniyên girîngiya xwe distîne.

Hîn ji sedemên ku nehiştin ew yekîtiyê û enî bi ser kevin, karaktera kesîtiya kurdî bi xwe ye, ew kesîtiya ku dîroka wî tu dewletên kurdî yekbûyî nedîtiye. Hemû hêzên dijî gelê kurd ên Kurdistana dagir kirine, her dem ji bo parçekirin û veqetandina kurdan xebitîne, hiştine ku parçekirin û veqetandin tevî xwîna vî mîletî bibe û di bîr û baweriyên wî de cih girtiye. Her wiha rola surîştê Kurdistana ya bi rêl û tîr çiya, ne hiştine yekîtiyê di nav kurdan de çêbibe, ji ber ku el û eşîrên kurdan

karibûne li ber xwe bidin û xwe ji dijminan biparêzin, vê jî hiştine ku dîwar di navbera neteweya kurd de bimîne. Nezanî jî dimîne yek ji sedemên girîng di tîkçûna wan yekîtiyan de. Her wiha ne tîgihîştina hevrikiya piçûk bi partiyên kurdî re. Hevrikiya sereke bi dijmin re û qelsiya karê demokrat di warê teorî û pratîk de ji wan sedeman e.

Ji bo yekîtiya gelê Kurdistana di warê rêzanî, aborî, civakî û çandî de helwesta we ji nêrîna nû ya girêdana kongreyeke niştimana Kurdistana, ji bo wergirtina biryarên girîng sebarê gelê kurd çi ye?

- Di baweriya me de girêdana wîlo kongre jî bo alîkarî û hevkarîyê di navbera aliyên tevgera rizgarîxwaza Kurdistana de zor girîng e. Ji ber ku ew rêxistina ku bê çêkirin, dê karibe bi navê gelê Kurdistana bi raya giştî ya cîhanê û rêxistinên resmî û gelêrî re bide û bistîne. Ji bona biserketina vî karî em dibînin divê berê tevgera kurdî di her parçeyekî Kurdistana de li ser xalên bîngehî û hawayên kar li hev bikin, rêzgirtina taybetiya tevgera kurdî di her parçeyekî de bête girtin. Divê tu tevgerê pêçiyên xwe nexê nava tevgera kurdî yê di parçeyên dîtir de û xwe nexê şûna wan. Piştî xwe ji rejîmên Kurdistana dagir kirine re tu carî vala nekin.

HEVPEYVÎN:  
FENER ROJBIYANÎ

**AWIR**

**Serî li benda doqik e**

**P**eyveke pêşiyar heye: "Dema ku ecelê gêrê tê perên wê çêdibe." Dawiya zaliman jî wilo ye...

Ew qasî zilmê dikin, çavên wan sor dibe, hişê xwe winda dikin û ya kesnedîtî tê serê wan.

Ji gotinan (li gorî rîwayetê) Nemrûd, gelek neheqî û kotekî li qewmê xwe dikir. Ji aliyekî ve jî berberî bi Xwedê re jî dikir. Xelîl Brahîm Pêxember jî yek ji mezlûman bû. Belengazên der û dorê jê dipirsîn: "Ya Pêxember ev zilm wê heta kengê bidome."

Xelîl Brahîm dibêje: "Hinekî din sebr bikin. Dawiya zaliman diyar e"

Rojekê, pêşiyek (kelmêşek) di firmikên Nemrûd re diçe ser mêjiyê wî, li hêtan dixê. Lê bêçare ye. Li xulamên xwe dike hewar. Dibêje: "Zû doqikan bînin li serê min bixin." Xulam heçkû dan dikutin, doqik li serî dixin. Çiqas doqik li serî dikevin, ew hîn bêhtir qîr dike û dibêje: "Hîn bi himettir lê bixin." Heta ku mêjiyê wî ji hev belav dibe doqik li serê wî dixin.

Vêca, dawiya Nemrûdên hemdem jî wilo dixuye. Geh serê xwe li Cûdî dixin, geh jî li Munzûr. Li timên taybet dikin gazî û hewar. Her çiqas xwînê vedixwin, çavsorî dibin, dest û lingên wan li hev digere. Riya ber lingên xwe nabînin. Qirêja lep û rûye wan dilop dilop tê

xwar (xwe bi jêr de berdide). Lê hîn têr nebûne. Hîna tîna dilê wan jî xwînê neşikestiye.

Bajarek ji miriyan ava kirine, lê têr nebûne. Şaht, kor, qop û kulekên şer mane li ber diwaran. Zarokên xizan û karkeran ên ku bêhemdê xwe li welatekî biyan û nenas ketine nav şer, roj bi roj terodîni (hişê xwe winda dikin) dibin. Gelek ji wan di vegera welatê xwe de jî xeweke bi dilê xwe nakin.

Nivê şevê vediceniqin. Hinek ji wan jî xwediyê xwe dişibînin gerîla û wan xwediyar gulebaran dikin.

Daristan bi me ve nehiştine. Hêlîn neman ku çûk tê de bilîsin. Gund neman ku zarok lê bilîzin. Lê bazirganên mirinê, evîndarên tariyê têr nebûne.

Ew nizanin ku wekî Nemrûd ew jî çiqas zilmê dikin, ew qasî mirina xwe nêzîk dikin. Nizanin ku xelekên pê benê xeniqandina bi destê xwe dihonin.

Ez baş dizanim, rojeke pîroz û spî, rojeke zêrîn û delal ji gelê me re xwe dixemilîne. Li ber zayînê ye. Ew roj di demeke nêzîk de wê wekî mêhvanekî/ê nivê şevê bêwext bide devê derî. Emê hev hambêz bikin. Lê Nemrûdên hemdem dê serê xwe li kuç û zinaran bidin.

Pêşî di firmik re ketiye hundir. Serî li benda doqikê xulaman e.

**HESEN ZINAR**

**Dewlet, naçariya xwe bi sotandina gund û daristanan derdixê holê Suruştiya Toros û Zagrosan ji hemû agiran xurttir e**

**BOTAN - BEHDÎNAN**

**14.8.95-** Li navbera Kirov û Biryana Şirnexê, di navbera gerîla û timên bizava taybet lihevixistineke dijwar rûda. Encama şer bi durustî nehate zanîn, lê tê gotin ku ziyarên mezin bi hêzên dewletê ketine.

**15.8.95-** Li devera Oremarê (Geverê), girekî ku ji aliyê 22 leşker û gelek cerdevanan ve dihat parastin, ji aliyê gerîla, ji du milan ve çeprast tê lêdan. Temet ku ji bêtêlên leşkeran hatiye zanîn, digel serleşkerêkî 7 leşker mirine. Gerîlayek jî bi navê Ayhan di vî şerî de miriye. Hêzên gerîla, digel desteserkirina hinek çekan, leşkerêkî bi navê Sedat Ağca bi dilî digirin û ji devera rûdanê bi dûr dikevin.

**17.8.95-** Li nêzîkî navenda Cûlemergê, şervanên ARGK'ê li ser riya Wanê kontrola xwe datînin û 90 trumpêlan li ser rê radiwestînin, li ser vê yekê hêzên dewletê bi piştevaniya çend zerîpoş, tank û bi alikariya cerdevanan bi ser gerîlayan ve diçin û di encama şerekî giran de, digel serkutbûna zerîpoşekê û bêserûberbûna tankekê, 4 leşker û 2 cerdevan tene kuştin.

Li devera Elbê jî, piştî êrişê gerîlayan bi serê sibê re, li ser Sengerê Qizilcê, kuştina 3 leşkeran û birindarbûna leşkerêkî hate tomakirin. Li aliyekî din, di encama peqîna 2 mayinan de li herêma Erişê (Şemzînan) 2 leşker tene kuştin.

Her di vê rojê de, li Çiyayê Pala ku raserî Şirnexê ye, di rast hatina hêzeke gerîlayên gerok û timên taybet de şer dest pê dike. Hate zanîn ku di vî şerî de, timêkî taybet tê kuştin.

**18.8.95-** Digel du gundên Hezoya (Qozluk), Newala Mezrê û Girê Morê çima ku gundiyan daxwaza dewletê ya cerdevaniyê herê nekirine û li devera Sêrtê jî daristanên herêma Mergê ku bi ser Şemzînan ve ye û daristanên herêma Perwarê û Dihê, ji layê hêzên dewletê ve hatin şewitandin. Li her du gundên Misircê, Filê û Aksê jî 2 trektor û patozeke gundiyan ji layê leşkeran ve hatin sotin.

Li devera Behdînan ji bilî sotandin û bombar-

dumankirina rojane ya çiya û daristanên Başûr, gundê Keperokê ku bi ser Mişarê ve ye ji aliyê leşkeran ve hate şewitandin.

Piştî êrişê gerîlayan ya li ser gundê cerdevanan Şervîna (Şemzînan), digel mirina gerîlayekî 7 cerdevan tene kuştin. Her di vê rojê de li aliyekî din hêzên gerîla li nêzîkî navenda Cûlemergê, riya Wan û Cûlemergê mawey demekê dixin bin kontrola xwe û di kontrolkirina nasnameyan de 3 serokcehan bi navên Yusuf Yolu, Kazim Yilmaz û Seyit Demir bi gulebarankirinê ceza dikin.

**19.8.95-** Hate zanîn ku hêzên gerîla li navenda Çelê (Çukurca) ji du

ser navenda Sêrtê ve ye, lê der barê encama vî şerî de tu pêzanîna bi dest neketin.

**21.8.95-** Li devera Şemzînanê, mayineke ku ji layê gerîlayan ve li ser riya Tabûra Helena hatibû çandin, di encama peqîna vê mayinê di bin zerîpoşekê de, digel mirina 4 leşkerên tê de ev zerîpoş serkut dibe. Li devera Qesuriyan (Qulaban) jî, di encama peqîna mayinekê di bin trumpêleke leşkerî de, digel bêserûberbûna wê, lê der barê kuştî û birindaran de tu pêzanîna bi dest ve nehatin.

**22.8.95-** Li dûv ragihandina çavkaniyên binecihi, li nêzîkî gundê Berokê (Perwarê), di rûdana şerê di navbera ge-

Paşa dikujin û kurê wî jî birindar dikin. Li ser vê yekê gundiyan Topalanê li navenda Çewlikê li ber parêzgehê xwepêşandaneke saz dikin.

**23.8.95-** Li derdorê Adakliyê ku bi ser navenda Çewlikê ve ye, hêzên ARGK'ê bi berbanga sibehê re, bi çekên giran êrişî ser çeperên leşkeran kirin. Hate zanîn ku di vê êrişê de, digel serleşkerêkî 2 leşker mirine, 4 leşker û gerîlayek jî birindar bûne. Dîsa li herêma çolter ya li navbera gundên Aşağıköy û Topalanê ku bi ser navenda Çewlikê ve ne, di navbera hêzên ARGK'ê û yê dewletê de şerekî dijwar bi dirêjîya 4 demjimêran rûdide. Di encama vî şerî de ku 2 firokên kobra



milan ve bi çekên giran êrişî ser binecihi û lojmanên polîsan dikin. Digel hebûna gelek kuştî û birindaran ji polîs û leşkeran jî, lê encama hijmara wan bi dirustî nehate zanîn.

Li devera Şemzînanê, şervanên ARGK'ê êrişekê dibine ser sengerekî leşkeran li ser Girê Sînovayê. Di encama vî şerî de ku ji serê sibê heta bi êvarê domiyaye, 7 leşker hatine kuştin.

Hêzên ARGK'ê li devera Heftanînê, êrişek dibin ser girên Serbest, Bezelik û Şivanê û digel kuştina 8 leşkeran li her sê giran, helikopterek jî derbe xwariye.

**20.8.95-** Li derdorê gundê Kezerê (Dihê) hêzên gerîla êrişî ser cerdevanan dikin û di encama vî şerî de hate zanîn ku 5 cerdevan mirine. Her di vê rojê de hêzeke gerîla êrişekê dibine ser sengerê Serêkarê ku bi

rîla û leşkeran de 2 leşker mirine. Dîsa di vê rojê de li devera Çelê li çiyayên Qeredax û Perwersêvdînê hate ragihandin ku di navbera hêzên dewletê û gerîlayan de şerên dijwar rûdane. Di van şeran de, 6 leşker mirine.

**23.8.95-** Şervanên ARGK'ê li devera Şemzînanê ji du milan ve êrişî ser tabûra Durê û gundê cerdevanan Sorensêrê kirin. Li gorî ragihandina rojnameya 'Milliyet'ê di vî şerî de 4 gerîla mirine û 19 leşker jî birindar bûne; lê Kurd-A'yê jî daxuyand ku di vî şerî de 4 gerîla mirine û 5 jî birindar bûne û ji bilî ziyarên cerdevanan digel subayekî 10 leşker mirine û gelek leşker jî birindar bûne.

**ÇEWLIK**  
**18.8.95-** Timên taybet, gundiyan Topalanê li gorepana gund kom dikin û gundiyeke bi navê

jî beşdar bibûn, 3 leşker mirin û 11 heb jî birindar bûn.

**MÊRDÎN**  
**22.8.95-** Piştî rûdana şerekî berfireh û dijwar di navbera gerîla û leşkeran de li devera Dîlanê (Kerboran), hate zanîn ku 5 leşker mirine.

**23.8.95** Gundiyeke ji gundê Perşabliyê ku bi ser Midyatê ve ye, ji layê leşkeran ve hate kuştin.

**BİLİS**  
**21.8.95-** Di dema kontrolkirina riya Bilîsê û Mutkê de, 6 cerdevanên ji gundê Xilolîkê digel 5 kilanşînkof û 2 şeşxwêran, ji layê gerîla ve tene girtin.

**ERZİNGAN**  
**15.8.95-** Li devera Erzînganê li geliyê Sansayê, piştî êrişê çekdarên ARGK'ê li ser hêzeke dewletê, hate zanîn ku 2 leşker birindar bûne.

**Kurd-A / Welatê Me**

# MED TV

Li ser Televîzyona Medê di medyaya tirk û kurd de gelek dîtîn û raman tîn zimên. Li ser xwestina Konseya Evlekariya Neteweyî, medyaya tirk a nijadperest di her fersendê de vê televîzyonê terorîst û neyar diyar dike. Yek caran jî henekê xwe pê dîkin. Mixabin yên ku fersenda bi me û zimanê me kenandinê, didin wan jî ji xebatkarên Televîzyona Medê wê de ne kesên din in. Nivîsek bi vî awayî di rojnama Yêni Yûzyilê (Sedsala Nû) de hat weşandin. Nivîskara rojnameyê Gülay Göktürk di vê nivîsa xwe de, ji aliyekî ve bi kurdiya kurdan dikene, ji aliyê di ve gunehê xwe bi kurdan tîne û kurdî zimanekî qels nîşan dide. Wergera vê nivîsê di Welatê Me de hat weşandin. Ji ber vê yekê ne pêwîst e ez bi dorfirehî li ser naveroka wê bisekinim. Jixwe babeta nivîsa me jî ne ew e.

Niha em li çapemeniya kurd binihêrin. Ji xeynî hinek rexnên ramyarî yên ku bi kêrî tiştêkî nayên, di çapemeniya kurdên bakur de bê pesndayînek tewş a bêwate em rastî raman û dîtînek rexnegirî nayên. Li ser bandora wê ya civakî dîtînen cur bi cur hatin zimên. Piraniya van nivîsan, xwe ji ti xûbên pesnên hîsî xelas nekirin. Gelek rewşenbîrên kurd bi giranî li ser pêwendiya televîzyonê û pêşvebirina zimên sekinîn. Lê tu kesî li ser kurdiya televîzyonê qet tiştêk neanîn zimên. Televîzyona Medê ne kurdî ne jî tirkî baş bi kar tîne. Dema ku em kurdî û tirkîya xebatkarên Medê didin ber hev, tirkîyek bêkêmasî bi kar tînin, lê kurdî mirdar dîkin. Dema ku mirov tirkîya wan dide ber tirkîya televîzyonên tirk kêmasiyên wan ên tirkî jî bi awayekî eşkere derdikevin holê. Di vê nivîsê de em dê li ser kurmançiya xebatkarên Medê bisekinin.

Yek: Navê televîzyonê çewt e. Bi qasî ku em zanin kurd nabêjin "Med Televîzyona" Ev nav peyv bi peyv li gor rêzimana tirkî hatiye fikirîn.

Heke kurdên ku navê televîzyonê "MED TV" lê kirine, qeydeyên rêzimanî yên nû afirandibin û ji xwe re di laboratuvarê de kurdiyêk bi qeydeyên tirkî çêkirine em wê nizanin. Bi qasî ku em zanin, hemû kurd dibêjin "Televîzyona Medê". Xebatkarên televîzyonê nizanin navê televîzyona xwe jî bi lêv bikin. Dibêjin "Med tî-vî". Di kurdî de navê tîpa "T/t" "tî", navê tîpa "V/v" "vî" nîn e. Celadet Bedirxan, Ensîtuya Kurdî ya Parisê, Kamuran Bedirxan û gelek zimanzan, lêger û lêkolînerên li ser kurdî xebitîne gotine ku, di kurdî de ji bo bilêvkirina bêdengî ji dengê "ê" tê istifadekirin. Li gorî vê dîtîne, bêdengên kurdî wiha bêtê xwendin: "bê, cê, çê, şê, tê, vê,..." Mamostê kurdî yê televîzyonê Amed Tigrîs jî, di dersên xwe de heman awayî rast derdixîne. Kurdên Bakurî di pratîkê de vê bi kar naynin, bêdengî wekî tirkîyan bi alîkariya dengê "e" dixwînin. Yanê wiha dixwînin: "be, ce, ce, se, şe, te ve."

Kurd tîpên alfabeya xwe wekî îngilîzan naxwînin. Dibe ku li Ewrûpayê di studyoyên televîzyona kurdî de, dengên kurdî bi îngilîzî derkevin. Heke sedemeke din heye bila xebatkarên Medê me agahdar bikin. Em dev ji çewtiyên xwe berdin.

Du: "MED TV" Zimanekî ku jê nayê têgihîştin bi kar tîne. Ji weşana xwe ya testê heta îro qet pêşveçûneke berbiçav tê de çênebû ye. Hinek pêşveçûn hene lê ev jî vê rastiyê ji holê ranakin. Hinek bi zimanê gundê xwe dipeyivin. Yên ku bi zimanê gundê xwe nizanin, an jî li bikaranîna zimanekî edebî dixebitin, ji yên pêşîn jî zêdetir çewtî û xeletiyên dîkin. Yek ji wan bi aqsanekî erebî ji peyv bi peyv wergera tirkî dixwîne. Di



Spîkerê programa Gotûbêjê ya MED TV tê xuyan.

bilêvkirina wî ya peyvên tirkî de tî fêmkirin ku ne Bakurî ye, an jî di dibistan û zankoyên tirkîyan de nexwendîye. Lê dîsa jî bi peyvên kurdî, gelek baş tirkî dixwîne. Bi gotînekê din tirkî dirame, kurdî dipeyive, an jî pê dîdin ezberkirin. Xebatkarê Medê yê din ê ku "Dengûbasan" dixwîne, ew jî wekî hemû hevalên xwe yên din, zimanekî mekanîk bi kar tîne. Wekî di rawestina giramî de li ekrana ber xwe dînhêre û dixwîne. Mirov di dema xwendina "Dengûbasan" de tu hîsekê li rûyê wî nabîne. Ew jî wekî hevalê xwe yê din mîna mirovên ku kurdî nû hîn bûne nikare zû bixwîne. Peyvan kîte bi kîte dixwînin.

**Li ser Televîzyona MEDê di medyaya tirk û kurd de gelek dîtîn û raman tîn zimên. Li ser xwestina Konseya Evlekariya Neteweyî, medyaya tirk a nijadperest di her fersendê de vê televîzyonê terorîst û neyar diyar dike.**

Pir caran di devên wan de deng li bin guhên hev dkevin, qet tiştêk ji xwendina wan nayê têgihîştin. Xwe şaş dîkin. Di rewşên wiha de jî, pir caran pêwîst nabînin peyva ku tê de xwe şaş kirine dubare bikin û ji ber vê kêmasiya xwe jî dîtmandan lêborîne bixwazin. Wekî tu tiştê ne bûbe, wekî yekî din xeletî kiribe, li xeletiyên xwe nabin xwedî û xwendina dengûbasên xwe dewam dîkin. Ev kêmasî di he-

mû bernameyên din de jî gelek bal dikişînin. Baş tî zanûn, mirovên di televîzyonê de agahiyan didin, gerek wekî bilbil bixwînin. Niha ez dixwazim ji van çewtiyan tenê çend mînakên bidim. Ez tenê dibêjim, ji ber ku hemû bername ji çewtî û xeletiyên dagirtî ne. Rastiya van mînakên di nav kevanê de hatiye nivîsandin. Wekî di mînakên de tî dîtîn, %99,99 xeletiyên di bernameyên kurdî de tînin kirin, ji ber peyv bi peyv tirkî wergerandinê û nezaniya rêzimanê kurdî tînin.

- 1- Şevê din di MED TV de... (Şeva din, di TV MED de...)
- 2- Li ser vî biryarê... (Li ser vê biryarê...)
- 3- Li navçeya Dağanşehirê ku girêdayî Meletiyê ye şer derket. (Li navçeya Doğanşehirê, ku li ser Meletiyê ye, şer derket)
- 4- Endamtiya Tirkiyeyê hat cemidandin. (Endamtiya Tirkiyeyê hat bişûnde xistin. An jî, "Endamtiya Tirkiyeyê sekinandin.")
- 5- Mirovên zanistî... (Mirovê zane, an jî "mirovê zanyar...", "mirovê zanist" û hwd.)
- 6- Rêxistinên ku vê daxwaziyê îmze kirin... (Rêxistinên ku ev daxwazî îmza kirin...)
- 7- Parlamen, parlament, parlament (parlament)
- 8-..... derdora navçeyê dan ber agirê topan

(... derdora navçeyê dan ber topan)

9- ... gireva birçîbûnê roja xwe ya nehan tije kir.

(... gireva birçîbûnê gihîşt roja xwe ya nehan, an jî ...neh rojên gireva birçîbûnê qediyên û hwd.)

10-... Li ser li dijî şerê bi qirêjê li Kurdistanê hatiye sekinandin.

(Li ser dijberiya şerê biqirêjê li Kurdistanê hatiye sekinandin)

11- Dewleta tirk 72 gundan vala kirin, 73 gundiyan kuştin

(Dewleta tirk 72 gund vala kirin, 73 gundî kuştin)

12- .. Ozanê ermenî Aram Tigran li Yûnansîtanê girevvanan ziyaret kir.

(Ozanê ermenî Aram Tigran, li Yûnanîstanê girevvan ziyaret kirin.)

13- ... Her çiqas destûr hatibû lidarxistin jî...

(Her çiqas destûr hatibû girtin jî... An jî "Her çiqas destûr hatibû dayîn jî...")

14- Li qampa penaberên bakurî ya Ertûşê agir derket.

(Agir bi qampa Ertûşê ya penaberên Bakurî ket)

15- Niha li stûdyoya me xwediyên şehîdan hene.

(Niha li studyoya me mirovên şehîdan hene)

16- Bê MED TV nameşe.

(Bêyî TV MED'ê nabe)

17- Lêkera "ragihandin"ê di kurdî de pir kêmtir bikaranîn. Lê di

"Dengûbasan" de em vê lêkerê hema hema di destpêka her hevokê de dibînin. Ev ne rast e.

18- Daçekên "ma, gelo" û hwd. di şûna qertafên pirsê de bi kar tînin. Di kurdî de qertafên pirsê tune ne. Divê xebatkarên televîzyonê jî rêzimana zimanê xwe jî kêmtir fêm bikin.

Xwezî kêmasî tenê ji nezaniya rêzimana kurdî bihatana. Lê em di nihêrin rewşenbîrên me yên di Televîzyona Medê de dixebitin, hîn hîn alfabeya kurdî jî ne bûne. Ev mînakên ku ez li jêrê didim vê rastiyê eşkere dîkin.

**BI KURDÎ BIPEYIVE  
BI KURDÎ BIXWINE  
BI KURDÎ BINIVISE  
BI KURDÎ BIFKIRE  
Jiyana Heywanan**

Wekî tîpên "MED TV" tîpên ku di alfabeya kurdî de tune ne jî bi kar tîne. Rojekê hinek tîpên din jî bi kar bîne, gerek e em mat nemûnin. Çima tîpa "I" bi kar tînin? Bersivê hêsan e. Ji ber ku ev tîp di alfabeya tirkî de heye. Em dê kengê xwe jî bandora tirkî xelas bikin. Bi van kirînen rewşenbîrên me, temenê nediyarîna vê dirêjtir dibe. Rewşenbîrên me yên ku hîna bi alfabeya nizanin û yên ku jî rêzimana kurdî ne agahdar in, ne mecbûr in di televîzyonê de bixebitin. Gelek karên ku bi zimanên din jî tînin kirin, hene.

ROJHAT AZADÎ



# Saziya çandê NÇM jî hate mehkemekirin

Doza ku Wezîriya Bazirganî û Sana-yiyê ya Tirkiyeyê, bi mebesta girtina NÇM'ê (Navenda Çanda Mezopotamyayê) vekir, di 23.8.1995'an de li Stenbolê, li Mehkemeya Asliyeyê ya Bazirganiyê çêbû. Di danîşîna mehkemeyê de parêzerên (e-bûqatên) NÇM'ê, li hemberî vekirina dozê, bersivên xwe pêşkêş kirin. Parêzeran, di bersivên

xwe de qala avakirina armanc û awayên xebata NÇM'ê kirin û gotin ku, vekirina dozê ji gelek hêlan ve ne li gorî qanûnê ye. Parêzer diyar kirin ku doz, li ser peymana avakirina şirketê jî hatiye vekirin, lê ev 4 sal e ku ev şirket (Şirketa Limited a Bazirganî, Reklam, Navenda Çandê û Lêgerîna Zanistî ya Mezopotamyaya Jorîn) xebatê dike. Daxwaza



parêzeran a dawîn wiha bû: "Ev doza ku tu eleqeya wê bi qanûnê nîn e û rê li ber azadiya bazirganî û mafê mulkiyetê

digire, divê bê redkirin û mesrefên mehkemeyê jî yên ku doz vekiriyê, bê standin."

Heyeta mehkemeyê, jî bo melzemeyên dozê baş bîn amadekirin, doz avêtin 12.10.1995'an.

Ji hêla din 100 endamên NÇM'ê xwestin ku mehkemeyê temaşe bikin, lê polîsan ew nexistin hundirê avahiya mehkemeyê.

Servîsa Çandê

## DEFTER

### Bawer bin



AMED TİGRİS

Dinya bi lez û bez digere û bi lez û bez tê guhartin. Polîtîka jî divê li gorî gera wê be. Heger mirov zana û hunermendê polîtîkayê be, dikare bi awayekî lez û bez hewl bide xwe pêgavên pozîtîv biavêje. Taktîkên nû û hemdemî bi kar bîne. Civatê biguhêre û bi pêş ve bibe. Carinan di demeke wiha kurt de guhartinên mezin û seyr çêdibin ku êdî hişê mirov nagire.

Mirov ji bûyerên guhartî matmayî dimîne, gelo ev rast in an na? Ka bîstekî guhdarî bikin; ez dê di vî warî de, ji we re behsa bûyereke nû bikim ku di van rojan de rûda an jî çêbû.

Di roja 15'ê Gelawêjê de, li Stockholmê mîtingek pêk hat. Yanî çêbû. Yanî 15'ê Gelawêjê hat pîrozkirin. Baş e lê kîjan hêz û rêxistinê mîtingê çêkirin û 15'ê Gelawêjê bi hev re pîroz kirin? Ev giring (muhîm) û seyr e! Vê mîtinga han partiya Swêdê ya merkezî ku navê wê bi Swêdî "Partiya Center"e, wê çêkir. Ev partî partiyekê burjûvazî ye. Niha 18 parlamenterên wê di parlamentoya Swêdê de hene. Center partiya gundiyan e. Lê ne wekî gundiyan me ku cihên mezelen wan jî tune ne. Gundiyan Swêdê wekî axayê Kurdistanê xwedî ax, traktor, makînen genimdirûnê (biçer), bexçe, vîla û mal in...

Belê, Partiya Center bi Konseya Kurd û Dêrên Swêdê re ve mîtinga han çêkir. Belê belê... we çewt nexwend, rast xwend... 15'ê Gelawêjê jî aliya Partiya Center, çend dêrên Swêdê û ji aliya Konseya Kurd ve li navenda bajarê Swêdê hat pîroz kirin! Li Meydana Humlegordenê bi hezaran kes beşdarî mîtingê bûn. Di rojêke xweş û ronî de, meydan jî alên ERNK'ê hatin xemlandin. Stran û folklorê kurdî deng û olan, dan meydanê...

Berpirsiyarên Dêrên Swêdê, di axaftinên xwe de, bi awayekî giştî li dij şer, kuştin, îşkence, çewsandin (pêkutî) û birçîbûnê rawestan û ji

bo têkoşîna gelê kurd piştigiriya xwe dan diyarkirin. Ji bo aştîyê stran gotin, dua kirin. Berendamê Parlementerê Partiya Center yê Yekîtiya Ewrûpayê Hans Lindqvist jî di axaftina xwe de, wiha digot:

- Dewleta tirk barbariyeke mezin li Kurdistanê pêk tîne. Heta niha bi hezaran kurdên sivil kuştine. Bi deh hezaran avêtiye zîndan. Bi milyon kurd jî ser axa wan rakirine. Daristanên kurdan şewitandin û dişewitîne. Zilm û zordariyeka nedîf li ser kurdan heyê. Divê dewleta tirk bi riyeke dîplomasî bi berpirsiyarê kurdan re rûn û bi awayekî aştî û siyasî meseleya kurdan çareser bikin. Kurd jî wekî hemû neteweyê dinyayê, divê azad û serbixwe bijin. Têkoşîna kurd rast û di cihê xwe de ye. Têkoşîneke mafdar û pîroz e. Em bi kurdan re ne... Heger ez wekî parlementerê Yekîtiya Ewrûpayê bêm hilbijartin, heta ku ji destê min bê, ez dê nehêlim ku Tirkiye bikeve Yekîtiya Gumrikê.

Berpirsiyarê ERNK'ê yê Skandinavyayê jî di axaftina xwe de, behsa têkoşîna 15'ê Gelawêjê, berxwedanên li zîndan û rewşa niha kir. Di dawiya axaftina xwe de, di qada navneteweyî de li ser rola Swêdê rawestiya. Xwest ku Swêd wekî dewlet jî bo şer-rawestandin û çareserkirina pîrsa kurdan di riyeke siyasî de rol bigire ser xwe û di nav herdu aliyan de hewl-danên diyalogan bide. Belê, dinya wiha bi lez û bez tê guhartin! Seyr (ecêb) e, na? Lê, bawer bikin rast e. Ev nişana çî ye? Nişana berfirehbûn û xurtbûna doza kurd e.

## Kovara rewşenbîrî û serbixwe: Pirs

Kovara Pirs, li Sûriyeyê derdikêve. Di du salan de 5 hejmarên wê hatine weşandin. Di hejmarê kovarê ya 5'an de nivîsa kovarê li ser sala 1995'an a Ehmedê Xanî ye. Hejmarê 5'an, li gorî hejmarên Pirsê yên din, bêhtir bi rêk û pêk hatiye hazirkirin. Bi gotineke din ber bi profesyonelîyekê

ve diçe. Di vî hejmarê de berhemên cuda cuda cih standine.

Nivîsên ku di kovarê de hene, ev in: Frazîologiya kurdî (Rezo), Sebaret pirtûka "Destpêka Edebiyata Kurdî" (F. Rojbiyanî), Riya kor yan mirovê bê hêvî (T. Marîni) Cegerxwîn û Brîvkanî (Dilovan), Xewna şewitî (Jan Dost), Keldûman

(E. Helîm Yûsif), Qendelîka Melê (Dimso), Çawa kurd mewîjan çêdikin (Keleş), Pirs a Pirs?, Helbesta kurdî (Azad Elî), Rojhilat (Axîn), Kerwanê Berbangê (B. Tosin), Firindeyê Xewnan û Evîna te (Xemcivîn), Em tev li pey rêça te ne (Mele Yûsif), Xewnek (Lîlîvan) û Firatê min (Xelîl Sasonî).

PIRS  
Pirs: Hejmar 5 - sal 2, 1995 Z. 2607K

- Frazîologiya Kurdî
- Cegerxwîn û Brîvkanî
- Xewna Şewitî
- Keldûman
- Qendelîka Melê
- Helbesta kurdî
- Riya Kor yan Mirovê bê Hêvî
- Rojhilat \* Xewnek \* Sersal \* Furatê min

## Delav, rojnameyêke bi kurdî li Sûriyeyê

Rojnameya Delavê, di pêşgotina xwe ya bi navê "Nû newîn" de qala 22'ê avrêla (nisan) 1898'an dike. Ji ber ku di vî rojê de rojnameya yekemîn a kurdî "Kurdistan" bi pêşkêşîya Mîqdad Mîhdad Bedirxan, hate weşandin. Delav jî aliya Komîteya Ronîs (di 22'ê avrêla 1994'a de

hatiye avakirin) ve hatiye derxistin. Li binê navê rojnameyê ev agahî hene: "Rojnameyêke Toreyî, Çandeyî û Serbixwe ye." Hejmara pêşîn jî di gelawêja (tebaxa) 1995'an de derketiye.

Rojname ji 16 rûpelan pêk tê û bi tîpên latînî tê weşandin. Di vî hejmarê yekemîn

de nivîsên celeb bi celeb hene, heke navê çend heban bê dayîn: Ebdilhekîm Yûsiv "Bihno qedexe", H. Hişyar "Jinên kurd di xwedîkirina zarokan û hînkirina ziman de", A. Bakasî "Pêşkevîna nivîsîna Kurdî"... Di rojnameyê de nûçe yên çandî, nivîsên folklorîk û hwd. cihekî mezin digirin.

**Nû newîn**  
Di 22'ê nîsanê de sala 2510 k-1898'ê rojnameya pêşî ya Kurdî li Kurdistanê bi navê pîroz (Kurdistan) û yekemînê Mîhdad (Qadîr) paşî li Cîmê li Londonê hate ragihandin û danerandin, bi serokatiya rojnamevanê yekemîn mamoste Mîqdad Mîhdad Bedirxan, rêberiya komîta sîngîrîna Kurdistanê dîro paşî bi rîberiya Mîhdad û M. Evdîrêman Bedirxan rojname berxweşan ku...

**Sevînen Ehmedê Xanî**  
Li gori hejmarê Mîhdadê Emîl Bedirxan ev sal, sala 1995'an biya sala mîrê hebesta Kurdî Ehmedê Xanî, çimkî 100 sal li ser Mîrê û Zîne dîhatîye, da ji bo vî yekê çêkê serbixwekirîna toreyî û bajarê Qamişloê û darêrîn di 25/1/1995'an de Qado Sêrîn û Hezî Evdîrêman paşî rabin di vî sevdî de hemû partî, kovar û nivîskarên Kurdî liê amodebûn Wê Evdîrêman Hezîl gotina K.Z. nîvê swêdî Ferhad çêlê gotina K. Guistan xwend. Bîrahim Dûf gotina K. Mewsim swêdî Hezî Evdîrêman gotina K. Asw swêdî û Azad Elî gotina K. Pîrs û Elîwaz swêdî. Zevan di gotinên xwe de tor, feble û jiyana mîrê hebesta Kurdî E. Xanî dan xuyakirin. Belê ne tenê ev hatin swêdî. Nivîsên Hezî Evdîrêman, Zevan, Qado Sêrîn, Hezîl basê Hebebeher yek ji wan ji çêkê xwe swêdî.

Di dawî re Qado Sêrîn gotarek li ser E. Xanî xwend. Nivîsên Azer, Dîdarê Asî, Hezîl, Keça Kurdî li her yekê ji wan hebestek xwe swêdî û wê sevdî de...

**Em tî bi nîkî**

Tu di rîya şoreşa Kurdistanê de şehîd ketî. Em te jî di şîrin cem şehîdan û dibêjin tu nayê jîbîr kirin.

**Ji Dirbêsiya Mêrdîne Hevalbendên Malbata Wê**

**Gülnaz Baqustanî**

Di greva mezin a ji 14 tîrmehê heta 20'ê Gelawêjê dewam kir de hûn her 5 qehreman,

**GÜLNAZ BAQUSTANÎ, FESİH BEYAZÇİÇEK, LÜTFIYE KAYA, AŞTÎ û REMZÎ ALTINTAŞ**

ji bo aştîyê ketin nav karwanê şehîdên Kurdistanê. Bila serê gelê kurd sax be ku şexsiyetên layikî wî derketine.

**Xebatkarên Rojnameya Welatê Me**

Di greva mezin a ji 14 tîrmehê heta 20'ê Gelawêjê dewam kir de hûn her 5 qehreman,

**GÜLNAZ BAQUSTANÎ, FESİH BEYAZÇİÇEK, LÜTFIYE KAYA, AŞTÎ û REMZÎ ALTINTAŞ**

ji bo aştîyê ketin nav karwanê şehîdên Kurdistanê. Bila serê gelê kurd sax be ku şexsiyetên layikî wî derketine.

**Xebatkarên Rojnameya Welatê Me**

**R**ezewanêk aşiqî kewle rêwî bû.. Rezekey be qed-palî çiyayekî bilinde-we bû. Teyr û tuwal lisyân lêdatû.. Le ser û hemûyanewe, Heloyek hêlaney lê kirdi-bû. Helo, le wê we agay le nihêniyekanî her du dîwî çiyake bû. Maweyek bû rêwiye-ke be niyazî xerab hamuşoy ew qedpaley çiyay dekird.

Rojêkyan rezawen teleyekî nayewe. Le ser telekeyş çeşey cê hişt. Katê rêwî be mate mate bo hêlaney kew û kotir degera, parçeyek goştî nayabî bînî. Le xişyan da, kewte sir û sema! Her demî bo bird û teleke teqî. Mam rêwî pêwe bû, deygrosand û hewarî dekird. Hemû giyanleberî newçeke waqyan wurma.

Helo, ser lutke day le seqeybal û le palî rêwî niştewe û gûtî: "Çon dawî rezewan?! Xo êwey rêwî be fêl û telekebazî be naw bangin."

Rêwî: "Be qurbanit bim, halim şire. Rizgarim bike..."

Helo: "Bew şertey bêçûwe balindekanî ew çiyaye têr bikey. Be taybetî, ewaney

bêbawik mawnetewe. Rojî jemêkyan le ser ew tawêre bo ro bike û biro."

Mam rêwî, be dem weqe weqewe gotî: "Wey be ser çawim. Lem ro we xerîk debim. De to firyam ke-we, ewsa debînî."

Helo: "Baş e wa mi-

## Tele

nîş rizgarit dekem."

Rêwî be şeşe şel day kêşaye dolêkewe. Rojêk, duwan û siyan têperî belam, mam rêwî gorî win bû. Rezewaniş zû zû telekey be raw de kirdewe. Rojêkyan mam rêwî bo milo û mûş rêy kewtewe rezeke. Per-

çe goştêkî bînî! Hoşî lay xo nema. Rabir-duy bîr çûwewe. Be pele prî da be lepe goşteke û legel prî pê dan, telekeş teqî! Goştî lê bûwe jehrî mar... Dey waqan û hewarî dekird, be firyam bikewen. Em çareş Helo day le seqeybal û hat le nêzîkî rêwî niştewe û gûtî: "Bo çî peymaneket nebîrde ser?!"

Mam rêwî parayewe gutî: Le dewrit girêmlî. Her em care rizgarim ke. Dan û awî gişt balindey em çiyaye le ser min. Be koli xom boyan kêşe ekem."

Helo be dengêkî berz sîrandî û gutî: "Biro, bêxêr. Çaket lê naweşêtewe. Bawerim be paranewet niye. Êsta barit kewtuwe, bo ye zimanit lûse. Egîna, ke azad bûy rîçekanî xot bîr dekey."

Helo day le seqeybal û helfirî û çûwe hêlaney xoy. Lewê we çawî lê bû ke rezewan hat û kotekêkî daye ser rêwî kuştî û le gel xoy bird.

Belê zarokên delal, bem şeweye rêwî, fêlbazyar le naw da.

AMADEKAR:  
DILÊR



## D Î T I N Ê R A M A N

### Wê rewşa welêt çawa be?!

**G**elî hevalên birêz ên Welatê Me, ji bo we hemûyan serkeftinê dixwazim. Hevalino, ez xwendevanekî Welatê Me me ku ev 3 sal in Welat û Welatê Me dixwinim. Ev rewşa ku em tê de ne wê heta kengê bidome. Ez li vir bange-waziya hemû gerdûnê dikim ewên ku dibêjin, "Ez mirov im, demokrat im, aştiyaxwaz im, sosyalist im û internasyonalist im... ji tevan re vê nameya xwe pêşkêş dikim. Xwendevanên Welatê Me li min biborin, lewre li zilm û pêkutiya romê dinihêrim ku ji roja gerdûn ava bûye û heya niha tiştêkî balkêş rû nedaye. Roj bi roj biratî û aştiya bav, dê, qîz, xort, xizan û yan jî dewlemend, werin em jî vê kampanyaya ku ji bo aştiyê di greva birçibûnê de ye, em jî piştgiriye

bidin wan. Digel dawî lêanîna nameya xwe ji me hemûyan re serkeftin û serxwebûnê dixwazim.

Bijî aştiya gelan. Bim-re birakûjî û şerxwazî.

Zekî Şer

### Bêrê ma zî çiyê bikerê

**A**med (Diyarbakir) sukêra rengîn a. Çend kes tê di estê bey-lu niyo. Roj bo roj dewan ra şaristananê (sukanê) werdiyan ra mêrdim bar kenê yenê Amed. Kar çîno.

Mêrdimî veyşan ê. Nêweşî qirik ra ya. Ekonomî xirab e. Çarşu di mêrdimî nêşênê xwi bileqne. Serey hergû mêrdimî jew esker û polis kewenê. Hergû goşe di tank û panzerî vinderle ye. Dewleta Romî tiya şel û şuhpe kena. Bawereya kurdanê Amedî nêkena.

Eke rojê raya şima bi-

kewo Amed, cuzdane xwi xwi vîr a mekerê. Lakî şima Kurdistan di maya xwi ra biy, xwi zîndanê rê hadire bikerê. Eke tîmî simbêlanê şima ra, çîmanê şima ra şuphe bikî, ay west serey şima zindan di vejiyêno. Xwi îskencedê giranî re hadire bikerê. Gama ki şima ben zîndan mevajê sucê şima çiçi yo! Demewo ki şima kotekan wenî bizanê sucê şima kurdbiyayîş o.

Amed wina yo. Bedenê ci sey verî pay jew jew cay bedenî rijiyayo. Hûkmat, nê bedenî restore nêkeno. No bedenî kî çend medeniyetî dest bin ra navedê.

Amed sukêra rengîn a. Serey mêrdimî esker û polîsan bigino zî, Amedijî aşti wazenê. Qandê aşti ewro mêrdimî xwi werdene. Mayê Amedijî vanê "Ma qandê aşti rê mirenê; ya do aşti bêro, ya zî ma do ebî veyşaney xwi bikşî!" Grevê veyşaney, bedenê Amedî ser ra çar qirniyan ra vila biyo. Mayê ma vanî "Aştî Bêrê ma mazî qandê aşti rê çiyê bikerê."

Polat Yılmaz

### Evîndariya herî mezin

**S**ilav li we gelî xebatkarên Welatê Me. Di kar û xebata we de daxwaza serkeftinê ji we re dikim. Xwişk û birayên hêja, az dixwazim di nameya xwe de hinekî li ser welatparweriyê bi-peyivim.

Ez nizanim çawa bidim xuyakirin, lê, li gorî zanîna min, di dinyayê de evîndariya herî mezin welatperwerî ye. Di jiyana me de gelek asteng hene. Dijmin welatê me dagîr kiriye. Her roj bi ser Kurdistanê me de agir dibarîne. Gund û zomên me xopan dike, daristan û zozanên me wêran dike û dişewitîne. Ji hêrsan agir bi kezeba min dikeve, rondik ji çavê min dibarin.

Gelî hevalan; daxwaza min ew e ku her kur-

dek, Welatê Me bixwîne û bide xwendin. Da gelê me fêrî xwendina bi kurdi bibe û ji xwendina kurdi hez bike. Da gelê me karibe zincîra nezaniyê zû bişikîne û di riya azardî û serxwebûna xwe de zû bi ser bikeve.

Ayhan Rêzan  
Agirî

### Bêrê ma zî çiyê bikerê

**H**evalên hêja, berî bi çend rojan em sê heval, ji girtîgeha Bursayê hatin ya Ermenekê. Li vir hejmara girtiyên siyasî nêzîkî bîst kesan e.

Ermenek, ji aliyê çûyîn û hatinê ve pir çep dikeve. Kovar û rojname dereng tîn ji me re. Lê hoyên girtîgehê li gor cihên din ne pir xerab in. Di van çend rojan de

peştê ku bala min kî şand, xwendina kovar û rojnameyên siyasî ne. Ji aliyê xwendinê ve tu qedexekirin tune ye lê, dereng digihên destên me.

Wekî girtiyên siyasî yên li Ermenekê, kampanyaya ku ji aliyê gelê me ve tê domandin, em piştgiriya wê dikin û bi kiryar em beşdarî vê kampanyayê dibin. Ji bo aştiyeke birûmet, em hemû girtiyên siyasî yên li vê girtegehê ketine mangirtinê.

Girtiyên ji doza PKK'ê û yên ji doza Platforma Yekîtiya Sosyalîstên Kurdistanê, em bi hev re tevî vê kampanyayê bûn û em ketin rojgirtinê.

Me ev nûçe şand navenda hemû rojnameyan lê, tu deng jê derneket. Daxwaziya me hemûyan ew e ku hûn, di rûpelên rojnameyê, di nav nûçeyên rojgirtinê de rewşa me jî binivîsin. Heger hûn, der barê me de xwendevanên xwe agahdar bikin wê gelekî baş bibe.

M.Can Azbay  
Girtîgeha Ermenekê

Li ser kesîtiya bîndest û kole, Li ser hişê dîl, bendî û xulam ne bes be jî, hin tişt hatine gotin û nivîsin. Der barê raman, nêrîn û tezên rewşenbîr, dîroknivîs, lêger û lêkolînerên me kurdan de ez dixwazim çend tiştan bibêjim..

Di nivîs û berhemên rewşenbîrên me de tiştinên ecêp derdikevin. Tercîh û encamên xebatên zanistî, tevî hev dibin. Ji ber ku îdeolojiyên resmî yê erêb, ecem û tirkan hebûna kurdan qebûl nedikirin û ew wekî erêb, ecem û tirk bi nav dikirin (heta beriya wan îdeolojiyan em, kurdên nifir-lêbûyî bûn), rewşenbîrên me dest hilanîn û bi pey bermayî, belge, berhemên dîrokî yê li ser navê kurdan ketin. Bi kurtî dest bi xebatên li ser hîm û koka kurdan kirin.

Di dawîya xebatan de fikiri-nen cuda derketin holê. Li gorî hinekan kurd, beriya zayîna Îsa bi hezar salî, ji bakurê Ewrûpayê hatine û Medî



## Civaka hişbirîndar

pêşiyên kurdan e. Kurd çavşîn û porzer bûne, bejindirêj û gir bûne û hwd. Jixwe zimanê kurdî dikeve nav koma zimanê hîndo-ewrûpî, ev jî delîleke din e ji vê yekê re.

Li hêla din, hin jî dibêjin ku kurd yek ji gelê binecihi yê Rojhilata Navîn e û ji tu deverê nehatine, her wiha ji wirê ber bi Ewrûpayê ve çûne. Bi gotineke kin, têkiliya ewrûpiyan bi kurdan re heye. Di encamê de herdu raman jî kurd û ewrûpiyan wekî xîzan û lêzim didine nîşan. Der barê vê rewşê de tiştinên din jî hene, ku hin kes hemû îcadên dîrokî

bi kurdan ve girê didin. Mîna dîtina agir, hevîr, nan, genim û kedîkirina hesp û sewalan ....

Tê zanîn ku li ser alfabe ya kurdî ya bi herfên latînî jî gengeşî hene. Hin kes hene, dixwazin ku alfabe ya me jî, ji 26 herfan pêk were û divê qet neşibe ya tirkî. Ji ber ku zimanê me, yek ji zimanê hîndo-ewrûpî ye û ewrûpî hemen hemen tev 26 herfan bi kar tînin.

Di vir de dixuye ku, ji ber tehdê û stemkariya serdest û serwerên erêb, tirk û ecem, rewşenbîrên me bi rik û gir û bi xeydan li mijaran dinêrin, wan

vedikolin. Di dawîya de jî xwe nêzîkî ewrûpiyan dikin. Her çend jî aliya dîrokî ve ele-qeyeke kurdan û wan bi hev re hebe jî, êdî îro pirtir têkilî û danûstandinên me bi gelên Rojhilata Navîn re hene, em tev xwedîyê qederekê ne. Divê em xweziya xwe bi xwe, bi têkoşîna xwe binin. Koka me, hîmê me çi dibe bila ew be. Wekî din jî divê mirov li gorî heqîqeta gelê xwe biryaran bide, diyardeyan binirxîne. Dilzîyîyê, hîsiyatê tevî xebatên zanistî (ilmî) neke.

Bîndestî û dîlîtiyê gelek ziyan daye hişê civaka me. Talankirin û wêrankirina manewî pir girîng e. Gava hişê neteweyekê bê kuştin, nema dikare ew bijî û jîna xwe bi serbestî bidomîne. Heke ne wisan bûya ev têkoşîna ku niha tê meşandin, ne li hemberî kesîtiya gelê kurd a ketandî bû. Baş tê zanîn ku hîna jî kurd bi xwe re şer dikin. Ango bi dijminê xwe yê hundirîn re.

## 50 sal berê deh milyon însan mirin û hîn jî dimirin

Di sala 1939'an de Şerê Dinyayê yê Duyemîn dest pê kir. Dewletên faşîst û dagirker Almaniya û Îtalya, di navbera xwe de peymanek di sala 1936'an de çêkirin, li gorî wê di dema şer de wê alîkariya hev bikin. Bi wê peymanê wan ku navê wê Koma Sondxwariyan (mîhweran) bû, Peymana Versailles (Versailles) qebûl nedikirin. Herdu dewlet piştî peymanê dest bi îşxalkirina dewletên der û dorên xwe kirin. Almaniyayê bi ser Çekoslovakiyayê û Awustiryayê ve girt. Li hemberî van dewletên faşîst Îngiltere û Fransayê jî komeke nû ava kirin, navê koma wan jî Koma Heval-

bendan (mutefîkan) bû. Di despêka şer de Almaniyayê, dewletên hevalbendan (Fransa Îngiltere û Rusya) têk dibin û her roj îşxalên xwe berfirehtir dikin. Ji van îşxalkirinan Amerîka jî tirsîya û piştgiriya hevalbendan kir. Ji hêla din ve, Japonya jî êrîşî ser Amerîkayê kir û şer li her derê dinyayê belav bû. Tirkiyeyê jî, di despêka şer de dît ku Almanya û Îtalya hevalbendan têk dibin, wê jî bi awayekî veşarî piştgiriya Sondxwariyan dikir, da ku erdê li Balkanan winda kiribû careke din bi dest bixe. Lê dema ku Amerîka beşdarî şer bû Tirkiyeyê û Rûsyayê bêterefbûna xwe îlan kirin.

Di encama şer de nêzi-

kî deh milyon însan hatine kuştin, 140 hezar mirov bi avêtina bombeya atomê mirin, Almaniyayê nêzîkî 100 hezar mirovî li kampên xwe bi gaza siyanûrê kuştin. 40 hezar ton bombe bi tenê li paytexta Almaniyayê Berlînê, hatin barandin, 200 hezar sivîl birîndar bûn, 5 milyon însan li derve man. Bi tevî leşker û sivîlan 10 milyon însan mirin. Îro jî li rûyê dinyayê li nêzîkî sed cihî şer heye, encama 50 sal berê hê jî didome. Ew dewletên ku pêncî sal berê 10 milyon însan qetîl kirin, îro jî bi firotina çekan û bi alîkariya dewletên dagirker, her roj bi sedan însan dikujin. Di sala 1986'an de şerê

di navbera Iraq û Îranê de, Amerîkayê çekên kimyewî û teknolojik dane Iraqê û ku li hemberî Îranê bi kar bîne. Şer 8 sal dom kir, di vî şerî de tiştê ku herî balkêş bû, Iraqê çekên ku ji Amerîkayê standibûn yê kimyewî li hemberî kurdan bi kar anîn, ji 5 hezarî zêdetir kurd li Helebçeyê qir kirin. Di sala 1990'an de car din şer li Rojhilata Navîn dest pê kir, ew çekên ku Amerîkayê çend sal berê dabûn Iraqê îcar Iraqê xwest ku li hemberî Kuweytê bi kar bîne, lê Amerîka, Fransa, Îngiltere û Almaniyayê ji ber menfeetên xwe ên di Kuweytê de destûr nedan Iraqê. Pê re şer kirin û ew têk birin û

bi hezaran mirov jî li vê derê hatin kuştin. Vê gavê jî li bakurê Kurdistanê şerê kurdan didome, di vî şerî de jî çekên ku Tirkiye ji Almaniyayê, ji Amerîkayê û ji Fransayê distîne li Kurdistanê li hemberî kurdan bi kar tîne û bi hezaran kurdan dike. Tirkiye her roj bi milyaran dolar pere xerc dike ji bo qirkirina kurdan. Encam, ew dewletên ewrûpayî û Amerîka, ji bo hakîmyeta xwe li ser dewletên wekî Tirkiyeyê û yê Rojhilata Navîn winda nekin, naxwazin aştî çêbe, aştî ji bo wan zirar e. Ji ber ku Rojhilata Navîn ji wan re sûka çekan e.

**METİN AKSOY**

## FERHENGOK

**Amojgarî:** Şîret, nasîhet  
**Awarte:** Kêncaran, îstisnaî  
**Bişkiyîn:** Vebûn, vebûna gul û kulîlkên dar û beran  
**Bizav:** Hereket, livîn  
**Drav:** Pere, di kurdî de li şûna 'îre, neqît' tê bikar anîn  
**Dramet:** Mahsûl, bêhemê karekî  
**Dol:** Newal, gelî  
**Ferman:** Emir  
**Fermandar:** Kesê ku fermanê dide  
**Fermanber:** Kesê bin emir  
**Fermander:** Ev peyv, bi taybetî bi berhemên teknolojik ve girêdayî ye  
**Mînak:** Kumanda  
**Gaber:** Taht, zinar, berên mezin  
**Kan:** Maden  
**Kotr, Kotir:** Kevok yê nêr, yan jî, kevoka çolê (kîvî, kovî)  
**Lîs:** Cihê ku heywanên bi per û bask xwe lê datînin

**Namilke:** Risale  
**Pasevan:** Nobedar, hîmaye  
**Patoz:** Mekîna ku palehiyê dike  
**Paşil:** Paxil, navbera mil û sîng  
**Qirak:** Teyrikekî reş e, mîna qijakê ye. (Reşkole)  
**Serkut:** Şikestin, neman (îmha)  
**Stembar:** Mazlûm, kesê ku zilm lê tê kirin  
**Stemkar:** Zalim, kesê ku zilmê dike  
**Şerpeze:** Şepirze, kesê perîşan, seffil û reben  
**Tena:** Rehet, bêêş û sergêjayî  
**Tomar:** Qeyd, tescil  
**Tomarkirin:** Qeydkirin  
**Veciniqîn:** Refleks (irkilmek)  
**Verêj:** Pirtûk, eser  
**Xwêrî:** Qeleş, bêbext  
**Zîrek:** Kesê çavnas û jêhatî  
**Zom:** Gundên havînî yê koçeran

## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

### Min Welatê Me Divê

<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 1.000.000 TL	<input type="checkbox"/> 80 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.800.000 TL	<input type="checkbox"/> 150 DM

Li derve buhayê rojnameyê 3 DM e.

### Bedelê Abonetiyê ez radizînim

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

**NAV û PAŞNAV** : .....  
**NAVNIŞAN** : .....

**Navnişana Welatê Me**  
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.  
Tel-Fax: 293 53 19 – 293 53 20

## WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
ROZA Basın ve Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)

**Aynur BOZKURT**

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)

**Zana FARQÎNÎ**  
**Aynur BOZKURT**  
**Sami TAN**  
**Suut KILIÇ**

Berpîrsiyarê Karê Nivîsaran  
(Yazışleri Müdürü)

**Metin AKSOY**

**NAVNIŞAN (Adres)**  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL-FAX**  
293 53 19 – 293 53 20

**ÇAPXANE**  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÜNERİ**  
(Temsilcilikler)  
**Çukurova**– Salihê Kevirbirî  
322-3597930  
**Suriye**– Jan Dost  
Fener Rojbiyanî  
**Berlin**– Silêman Sido  
Sîrwan Reşîd  
49-30-69002695

**Hannover**– Selîm Biçûk  
49-5721-81360  
**Hamburg**– A.Hekim Gülsün  
49-40-403388

**Munchen**– Mahmut Gergerî  
49-871-670884  
**Badenwürttemberg**–  
A. Rahîm Ayaz  
49-75453258

**Amsterdam**– Cotyar Zaxoy  
31-20-6130766  
**Paris**– M.S. Ayçiçek  
33-1-48000401  
**Atina**– Ferhan Zêbarî  
30-13634905  
**Bruksel**– Medenî Ferho  
32-16-490767  
**Stockholm**–  
Robîn Rewşen  
46-8-7510564

# Berpirsa Rojnameya La Nationê Salîma Xezalî: Berdêla rojnamegeriya durist li Cezaîrê mirin e

Berpirsa rojnamegeriya li Parisê li konferanseke ku li ser pirs-girêkên rojnamegeriyê hate lidarxistin, axaftina Salîma Xezalî bala hemû beşdarên kuşandê ser rewşa rojnamegeriya li Cezaîrê. Tiştên ku berpirsa îdarî ya Rojnameya La Nation anîn zimên, bi her kesî da fêmkirin ku li hin welatan rojnamegerî di şertên pir dijwar de tê kirin û mirin her tim gelek nêzikî rojnamevanên durist e li wan welatan.

Salîma Xezalî bi van gotinan dest bi axaftina xwe dîke: "Em êdî ne di bin hakimiyeta dewletekê de dijîn ku dîktatoriya wê eşkere ye. Rejîma ku em di nav de ne, îfade dîke ku li dijî terorîzma hov têdikoşe. Qet nebe dixwaze îmajêke wisa bide me." Berpirsa Rojnameya La Nationê (kovareke hefteyî ye û tîraja wê 60 hezar e) piştî van cumleyan, gotinên xwe wiha didomîne: "Tevî wê yekê ji roja ku şerê hundirîn li Cezaîrê dest pê kiriye heta îro, nêzikî 40 rojnamevan hatine kuştin. Dema li cihekî bûyerek biqewime, an jî yek bê kuştin, em bi xwe nikarin pirsîyarî an jî lêgerînê bikin; em nikarin nûçevanên bişînin cihê bûyerê, em nikarin ji kesên ku bûyerê dîtine, derbarê bûyerê de tişteki bipirsin. Eger rojnamevanek xwe li tişteki wisa

biceribîne, wê rojnameya ku ew tê de dixebite bi pêvajoya 40 roj an jî 6 mehan bê girtin, ji bo rojnamevan jî ne diyar e wê çiqas ceza bête birîn."

Bêguman ev tiştên ku Salîma dibêje reaksiyona DGM'ya Tirkiyeyê ya li hemberî rojnamevanên kurd tîne bîra mirov. Nexasim jî, gotinên wê yên ku niha wê li jêr bêne dayîn, eger navê Cezaîrê tê de derbas nebûya, we yê bigota qey ji bo dewleta tirk hatine gotin:

"Çi agahiyên derbarê ewlehiyê de di rojnameyan de tîne weşandin, lazim e yên resmî ango yên hikûmetê bin. Ev agahî ji aliyê ajansa resmî ya hikûmetê ve li çapemeniyê tê belavkirin. Em jî xeynî agahiyên ajansa resmî, nikarin tu nûçeyên din biweşînin."

Li vê derê ferqek derdikeve holê, di navbera çapemeniya Cezaîr û Tirk de; çapemeniya Cezaîr ji neçarî nûçeyên resmî dide û hew. Lê ya tirk ji xeynî nûçeyên resmî yên ku ew bi xwe jî amade dîke, ji yên dewletê bêhtir alîgirên dewletê ne, diweşîne. Ev jî nişan dide ku tevî neçariya xwe, çapemeniya Cezaîrê ji ya tirk duristtir e.

Salîma Xezalî bi van gotinên li jêrê jî, em bixwazin nexwazin, dibe sebeb ku dîsa azadiya çapemeniyê ya li Tirki-

yeyê bi ya Cezaîrê re were bîra me.

"Di demê bêdeng û tenha de, hikûmeta Cezaîrê behsa sabotaj û terorîzmê dîke, wêneyên jin û rojnamevan ku xwedêgiravî ji aliyê terorîstan ve hatine kuştin belav dîke. Ji bo dewletê serkeftî nişan bide jî, dibêje ku her roj bi duzîneyan terorîst tîne kuştin û hwd. Li aliyê din dewlet tu car hejmara leşkerên kuştî diyar nake."

Salîma dibêje ev îmajê ku dewlet pêşkêş dîke pir eletewş e. Li ser eletewşiya nûçeyên dewletê Salîma dîtînen xwe wiha didomîne: "Pir eşkere ye ku du hêz di şer de ne, lê em derbarê yekê tenê de dibin xwedî agahî. Bi temamî qedexeyê diyarkirina kuştîyên artêşa Cezaîrê. Tevî wê yekê em rastîyan hîn dibin, gel jî hay ji her tiştî heye. Bi cureyekî telegrafan ku jê re dibêjin "bush" û dewlet nikare rê li ber bigire, her kes her tiştî hîn dibe. Mesela heval an lêzim û an jî naskirî yên ku li cihê bûyerê diqewimin dijîn, li ser bûyeran pêşî bi hev re dipeyivin, dî re bi kesên din re û gotinên wan bi wî şêklî li her derê belav dibin. Dema artêşa Cezaîrê dibêje 15 terorîst li El Harrachê hatine kuştin, kesên li wê derê dijîn telefonî me dikin û dibêjin, tenê du militan



**Salima Xezalî:**  
"Çi agahiyên derbarê ewlehiyê de di rojnameyan de tîne weşandin, lazim e yên resmî ango yên hikûmetê bin. Ev agahî ji aliyê ajansa resmî ya hikûmetê ve li çapemeniyê tê belavkirin."

hatine kuştin, yên din jî kesên ji rêzê ne û tu eleqeya wan bi bûyerê ve tune."

Li ser hev dîtînen herdu hêzan jî Salîma tiştên balkêş dibêje: "Ji xeynî agahiyên ewlehiyê, hin tiştên din jî hene ku em nikarin binivîsin. Mesele çapemeniya Cezaîrê nikare nûçeyan li ser tîkiliyên veşarî yên navbera rejîmê û îslamiyan biweşîne. Ev tîkiliyê her tim çêdibin, lê nivîsîna li ser wan qedexeyê. Wekî din em nikarin li ser îşkence û neheqiyên din ên ku ji aliyê rejîmê ve tîne kirin jî binivîsin. Lê tevî wê yekê em bi awayekî rê dibînin û in-

dirêkt be jî li ser van hemûyan dinivîsin."

Salîma bi van gotinan axaftina xwe temam dîke: "Pêdiviya me bi pişt-girî û alîkariya rêxistinên navneteweyî heye. Armanca me û karê me ew e ku em nakokiyên wê rejîmê bi her kesî bidin dîtînen. Wekî din em dixwazin ku, pîrên nefretê di nav gel de çênebin. Di nav xwendevanên me de yên ku alîgirên îslamiyan in jî hene, lê ji me re di nîmeyên xwe de dibêjin ku ew ne di dîtîna me de ne, lê ji ber demokratbûna me hurmetê didin me."

MAZHAR GÜNBAT

**elincuêrek**

